

kovara hunerî, çandî û lêkolînî ya kurdên anatoliya navîn

# bîrnebûn

ZIVISTAN/2011



Zimanê kurdî di rojevê de ye

*Nebi Kesen*

Goştê helal

*Îbrahîm Korkmaz*

Hevpeyvînek bi Bilal Înekcî re

*Metin Kara*

Bîranîn û sohbetek bi Rifat Îlhan re

*Mem Xelikan*

Deh û du salî bûm, bûm berdêl

*Altun Başaran*

Hecîyê Gulê

*Seyfî Doğan*

Guranîyelî kurdgelî Şêxbizinî

*Brang Şêxbizinî*

48

# bîrnebûn

Tidskriften utkommer 4 nummer per år.  
Sê mehan carekê derdikeve / Üç ayda bir çıkar.

Utges av Apec-Förlag AB  
Hejmar 48, zivistan 2011

Ansvarig utgivare: Ali Çiftçi

Editor: Ali Çiftçi Seyfi Doğan Muzaffer Özgür

Koma redaksiyonê

A. Çiftçi, Dr. Mikailî, H. Erdoğan, M. Bayrak, İ. Türkmen,  
M. Duran, Muzaffer Özgür, Nuh Ateş, Sefoyê Asê, Vahit Duran,  
Mem Xelîkan, Mustafa Mih û Yusuf Polat

Adress

Navnîşana li Swêdê

Box: 8121, SE 163 08, Spånga/Sverige

Telefaks: 0046-(0)8-761 24 90

E-post

info@birnebun.com

Internet

www.birnebun.com

Têkili/Îlişki

Danimarka: Irfan Baysal, 0045-27 11 58 83

Avusturya: Cüneyt Dagdalan, 0043-69 91 11 55 294

Amerika: Mam Recall, mamoste.kart@yahoo.com

Belavkirin / Dağıtım

Ewropa: Muzaffer Özgür/Birnebûn

Postfach 900348, 51113 Köln / Almanyaya

Tfn: 0049-172 298 24 51

Türkiye/Ankara:

Dipnot Kitebevi, Selanik Caddesi No: 82/32

KIZILAY / ANKARA

Tfn: 0312-419 29 32

Anatolia Muzik Center

Cumhuriyet Mah. Turan Cad. No: 29 A

Polatlı-Ankara

Tfn.: 0090-312-622 94 36

İstanbul: Selahattin Bulut/Medya Kitapevi

İstiklal Caddesi, Elhamra Pasaj No: 130/6, Beyoğlu

Biha/Fiyatı

Europa: 5 Euro • Türkiye: 2,5 YTL

Abone

Swêd: 400 SEK • Almanyaya 40 Euro

Welatên din ên Ewropayê: 50 Euro

İsveç hesap numarası

(Birnebûn) postgiro: 468 65 12-7

Ji bo aboneyên li derveyî Swêdê / İsveç dışındaki aboneler için

APEC, "Birnebûn" PlusGiro-Stockholm/Sweden

BIC: NDEASESS

IBAN: SE85 9500 0099 6026 4686 5127

Çap / Baskı

Apec-Tryck AB

ISSN 1402-7488



Rifat İlhan û çend endamên Ankara DDKD li nexwaşxaneyê li cem Ali Aslan in. (1975)

Her nivîskar berpirsê nivîsa xwe ye.

Mafê redaksiyonê heye ku nivîsên ji Birnebûnê re tèn, serrast û kurt bike. Ger nivîs çap nebin jî, li xwedîyan nayên vegerandin.

Waqfa Kurdên Anatoliya Navîn li Swêdê û Komela Ziman li Almanyayê piştgirên kovarê ne.

# NAVEROK / İÇİNDEKİLER



Wêneyê li bergê:  
berêvareke ber bi Çola Xwê



- 2 Ji Bîrnebûnê – *Ali Çiftçi*
- 4 Li Ankarayê şeva KURD-DERê – *Mem Xelikan*
- 6 Di nava 50 navdarên Danîmarkî de jineke kurd – *Red/Avesta*
- 7 Zimanê kurdî di rojevê de ye – *Nebi Kesen*
- 10 Bîranîn û sohbetek bi Rifat Îlhan re – *Mem Xelikan*
- 18 Dîroka kurd û Kurdistanê – *Şakir Epözdemir*
- 30 Hevpeyvî bi Bilal Înekçi re – *Metin Kara*
- 33 Pêşbirka ceribandînê ya navnetewî – *Nuh Ateş*
- 41 Goştê helal – *Îbrahîm Korkmaz*
- 42 Berxa Pîrê – *Îbrahîm Korkmaz*
- 43 Deh û du salî bûm, bûm berdêl – *Altun Başaran*
- 45 Lillith/Lilî: Pîrika Nûra Hesê Hemê – *Ûsikê Cimik*
- 47 Li kucê tarî – *Seyfî Doğan*
- 48 Ne şewitîm ne jî vemirîm – *Xizan Şîlan*
- 49 Şervan – *Şivan Zeren*
- 50 Zarokên kurd – *Îbrahîm Korkmaz*
- 51 Çola Xwê – *Seyfî Doğan*
- 59 Heciyê Gulê – *Seyfî Doğan*
- 63 Guranîyeli kurdgelî Şêxbizîni – *Brang Şêxbizîni*
- 68 Kitêba Burhan Sönmez – *Ronê Hatmann*
- 72 Sabah Uyandıgımda – *Nesrin Bayram*
- 74 İçtoros Kızılbâş Kürtlerin' de Ağıt (Şin) Geleneği – *Mehmet Bayrak*



Xwendevanên birêz bi vê hejmarê 48an em sala we ya 2011an pîroz dikin û bi hêviya ku ev sal bibe saleka aram û serkerftî bo hemû gelên cihanê û herwiha bo xelkê me jî.

Di van rojana de li welêt û li Tirkiyeyê pirsê mafê perwerdeya bi zimanê dê û du-zimanî di medyayê de bi giranî cih girt. Piraniyan ev mafêke pîr xwezayî dîditin ku divê bê bikaranîn. Heta hinekan jî perwerdeya bi zimanê dê wek şîrê dayîkê helal bi nav kirin.

Lê hem ji aliyê dewletê ve û hem jî ji aliyê nijatperestên tirk ve ev rojeva du-zimanî wek “parçebûna Tirkiyê” bi nav bû.

Ji bo kurdan a girîng ew e ku divê di hemû warê jîyanê de daxwaza bikaranîna zimanê xwe bikin. Zimanê xwe li her derê bi kar binin û dest ji daxwaza perwerdeya zimanê kurdî bernedin.

Di vê hejmarê de nûçeya birêz Mem Xelikan a *Şeva KURD-DERê* ku li Ankarayê çebûye numûneyeka baş e ku piraniya siyasetmedar û rewşenbîrên kurdên xwedî dîtînen cuda hatine ba hev ji bo parastin û aktualizekirina ziman û çanda kurdî, bi hev ra şevêka şênayîê buhurandine.

Birêz Nebî Kesen li ser gotûbêjên aktuel ên li ser du-zimanî û perwerdeya bi zimanê dê, bi sernivîsa *Zimanê kurdî di rojevê de ye* dîtîna û pêşniyazên xwe nivîsiye. Birêz Nebî di vê nivîsa xwe de balê dikişîne ser hîlbijartina 2011an ku kurd

rojeva hîlbijartinê bikin kampanya nasname û zimanê kurdî.

Mem Xelikan bi sernivîsa “*Kurd hatin li dibistanan toy rabûn*” bi Rifat Îlhan re sohbetek kiriye. Birêz Rifat Îlhan ji kurdên Anatoliyê ji bajarê Kirşehrîrê ye. Di salên 1970î de wek xortekî şoreşger di nav tevgera kurd de cih digrê, dikeve zîndanê û dibe xwediyê gelek serpêhatiyên.

Dagirkerên welatê me bi zanistî xelkê me di warê dîrok û mîrasa çanda kurdî de bêpar hîştine. Birêz Şakir Epozdemîr ji bo ku bala ciwanên kurd bikişîne ser dîroka kurd û Kurdîstanê, bi kurtî dîroka kurdan ji dema berîya împêratoriya Medan, heta dewleta Ferderal a Herêma Kurdistana Başûr, bi sernivîsa *Dîroka kurd û Kurdistanê* nivîsiye.

Herwiha hevkarê me birêz Metîn Kara hevpevînek bi Bîlal Înekçi re kiriye. Bîlal Înekçi yek ji wan kurdên me yên Anatoliyê ye ku bi salan e di nav politikaya Danmarkê de aktîf e.

Birêz Nuh Atêş bi nivîsa xwe ya *Pêşbirka ceribandîna ya navnetewî: “Dahatuyê ji rabirdûyê û rabirdûyê jî ji dahatuyê xelas bikin”* beşa diduya ji bo me wergerandiyê kurdî. Ev nivîs di sala 1998an de ji bo pêşbirka navnetewî bi zimanî almanî hatiye nivîsandin. Me beşa yekem di hejmarê 47an de weşandibû.

Birêz Îbrahîm Korkmaz ji folklorê me bi navê *Berxa Pîrê* û serpêhatiyeka xwe

ya bi navê *Goştê helal* di vê hejmarê de nivîsiye.

Hevkara kovara me Altun Başaranê jî li ser berdêliyê sohbetek bi sernivîsa *Deh û du salî bûm, bûm berdêl* bi Fatê xanimê re kiriye. Berdêlî formeka zewacê ye ku heta van salên dawîn jî di nav ciwata me da pir caran dibû. Niha wek berê nebe jî carina rûdide. Başî û nebaşiya zewaca bi berdêliyê hûn dê ji devê Fatê xanimê bi xwe di vê hejmarê de bixwînin.

Ûskê Cimik piştî demekê, bi sernivîsa *Lillth/Lilî Pîrika Nûra Hesê Hemê* vegotinekê beşdarî vê hejmarê bûye.

Di quncika helbestan de, ji Seyfî Doğan, Xizan Şilan, İbrahîm Korkmaz û Şivan Zeren helbest hatine weşandin.

Birêz Seyfî Doğan bi sernivîsa *Çola Xwê* gernameyek li ser çûyîna me ya Çola Xwê ya havîna 2010an bi zaravê xelika li gel çend wêneyan weşandiye.

Bi sernivîsa *Heciyê Gulê* birêz Seyfî Doğan serpehatiya bapîrê xwe û pezbirina wî ya Istenbolê bi kilama ku li ser hatiye gotin, ji berhevkar Suatê Xecê guhdarî kiriye. Û wek hekat ji bo vê hejmarê nivîsiye. Hekateka ku berî sed salî rûdaye, di gelek warên jîyanê de balkêş e.

Birêz Brang Şêxbizînî vê carê jî bi sernivîsa *Guranîyêlî kurdgelî şêxbizînî* beşdarî me ye.

Ebdulrehman Seîd Zengene bi navê *Sofizim, cewherê ola pêxemberan e* kitêbek di nav weşanên Apecê de bi zimanê erebî, li ser babeteka balkêş weşand. Ji bo vê me

ji pêşgotina kitêbê û li ser naverokê ji bo xwendevanên xwe parçeyek wergerand kurdî.

Ronî Hartmann bi sernivîsa *Kitêba Burhan Sönmez: Kuzey* hem birêz Burhan Sönmez bi me dide nasandin hem jî ji kitêbê wî hinek rûpel ji bo me wergerandine kurdî.

Di beşa zimanê tirkî de Nesrîn Bayramê bi sernivîsa *Sabah Uyandığında* serpehatiyeka xwe ya balkêş nivîsiye ku piraniya kurdên li Tirkîyê dikarin xwe tê da bibînin. Nesrîn xanim nivîsa xwe wiha bi dawî tine; ... *hêdî dor hatibû ku ez dê gotina xwe bi cih bînim. Ji wê rojê û heta niha min li ku salmezinnê/ka ji Anatoliya Navîn didît pê ra sohbet dikir. Derd û kulên wan, diltengî û dîlşayî, evîn û jîyana wan guhdarî dikir, berhev dikir û dengên wan arşîv dikir. Ez bi xwe jî helbestên li ser êş û hesretê bi kurdî dinivîsînim û êş û kederên xwe bi wan par ve dikim û dibêim êdî wext hatiye wan belav kim...*

Birêz Mehmet Bayrak bi sernivîsa *İçtoros Kızılbaş Kürtlerinde Ağıt (Şîn) Geleneği* bi tirkî ji nivê sedsala 16an heta dema nû ji folklorê kurdên "Kızılbaş", bi taybetî li ser kilamên şînê lêkolaye û jê hinek parçeyên bi kurdî û tirkî jî ber hev kirine.

Bi hêvîya ku ev hejmar jî li gor dilê we be, bimînin di xêr û xweşiyê de!

**Ali Çiftçi**

## Li Ankarayê şeva KURD-DERê

Mem Xelikan

Wek hersal îsal jî Kurd-DERê li Ankarayê di roja 12.12.2010an de şeveke bi xwarin li dar xist. Şevê li saet heftê paşnîvro bi axaftina serokê komelê birêz Ahmet Aday dest pê kir.

Birêz Aday, di axftina xwe de bi kurtasî da zanîn û got:

"Wek tê zanîn, gelê kurd di erdnîgariya rojhilata navîn de bi zimanê xwe, bi çanda xwe û bi şaristaniya xwe gelekî herî qedîm e. Çendî zimanê kurdî, zimanekî herî qedîm be jî û ji aliye 40 mîlyon mirovan ve tê axaftin jî, lê mixabin di rojên îroyîn de kurdî li Tirkîyeyê tê înkarkirin. Çendî bi destên dewletê TRT6 weşana bi kurdî dimeşîne û li çend zanîngahan beşên kurdî hatibin damezarandin jî, li gora zagonên Tirkîyeyê kurd û kurdî nînin. Parlemen û dadgehên Tirkîyeyê ji zimanê kurdî re dibêjin "Zimanê ku nayê nasîn û zimanê ku nayê zanîn."

Ji ber ku kurd bikaribin piştê înkare bişkênin û pêşiya asîmîlesyonê bigirin, divê di her qada jiyane de bi kurdî biaxifin, bi kurdî bixwînin û bi kurdî binivîsin.



Hunermend Lokman Mûsa.

Bila herkes baş bizanibe ku hetanî gelê kurd, li ser erdnîgariya Kurdistanê bi nixên xwe yê netewayî azad nebe, dê tekoşîna azadiyê bidome."

Dûre bi çêşeke mezin şevê dest pê kir. Ji stranbêjên Kurdistana Sûrîyê Lokman Mûsa, ji Anatolîya Navîn Koma Xelikan, hunermend Nîmet Yıldız bi stranên xwe yê xaş çêşeke mezin dane şevê. Bi qasî 300-400 beşdarên şevê hebûn. Beşdaran hetanî nîvê şevê bi



Hunermend û dengbêj Nîmet Yildiz

çoşeke mezin govend gerandin.

Dîwarên salonê bi afîşên weke:

\* Zimanê min nasnameya min e.

\* Em perwerdeya bi zimanê xwe dixwazin.

\* Di her qada jîyanê de:

*Bi kurdî biaxivin*

*Bi kurdî bixwinin*

*Bi kurdî binivûsinin*

\* *Kurdî stêrka geşa ya ezmanê welatê me ye.*

\* *Dilimin sîmurları Dünyamın sîmurlarıdır."*

hatibûn xemilandin.

BDP, Hak-PAR, KADEP, SES,  
78LİLER GİRİŞİMİ, EĞİTİM SEN,  
İHD, YAPI YOL SEN, Bi nûnerên xwe  
beşdarî şevê bûn.



Hunermendên Koma Xelikan Ergin.

# Di nava 50navdarên Danîmarkî de jineke kurd



Rojnameya tîraj bilind a Danîmarkayê, *Politiken*, 50 kesên ku li welêt herî zêde, ser axaftin dibe tesbît kirin. Di lîsteyê de siyasetmedara kurd a Tîrkiyeyê Özlem Çekiç jî cih girt.

Juriya rojnameyê ku ji 40 kesan pêk hat, bi navê “*Lîga Super a Salê*” lîsteyek derxist. Parlamentera Partiya Sosyalîst a Gel jina kurd Özlem Sara Çekiç, di lîsteya 50 kesî de, di rêza 28emîn de cih girt.

Yekemînê lîsteyê, serokê partiya Çekiçê, Villy Sövdahl derket û endamê Partiya Gel a Danîmarkayê û Parlamentoya Ewropayê Morten Messerschmidt jî di rêza 29emîn de cih girt. Wezîrê Karên Hundir Bertel Haarder di rêza 34emîn de, karîkaturîstê navdar Kurt Westergaard

jî di rêza 25emîn de cih girt.

Özlem Sara Çekiç, di nava siyasetmedarên ku ser bûyerên rojane herî zêde daxivin de bû 6emîn. Çekiç ser serkeftina xwe wiha axivî:

“Siyasetmedarên navdar li paş hîştin, hesteke xweş e. Di lîsteyê de, di nava koçberan de tenê ez heme û ev yek jî bo civaka min şanazî ye. Ez qasê ku mimkun e, mijar û kêşeyên rojane di medyayê de tînim ziman. Hêvîdarim ku, di sala bê de, hê zêde serkeftî bim.”

Nûçe: Nesrîn Bayram

Wergêr: ym (AKnews)

*Ev nûçe ji malpera Avestakurdê hatiye wergirtin.*



# Zimanê kurdî di rojevê de ye

Nebi Kesen

Dawîya sala 2010an niqaşek nû li ser statuya zimanê kurdî û bikaranîna du-zimanan dest pê kir. Ev niqaş di nav-bena berpirsên dewleta Tirkîyê û kurdan de bi helwestên ji hev cuda ê hîn jî bê berdewamkirin. Ji ber ku zimanê zikmakî di qebûlkirina nasnameya kurd û çareserkirina pirsgirêka kurd de, rolekê navendî dilîhîze. Ji alîyekî asîmîlasyon û jibîrkirina kurdî roj bi roj xurt di-be. Ji alîyê din ve bingehê nasnameya kurd berê her tiştî ziman e, ango kurdî ye. Qebûlkirina nasnameya kurd li Tirkîyê, bi perwerdeya bi zimanê kurdî ve girêdayîye û divê dewlet mafê ziman bi awayekî fermî pêk bîne.

Xuyaye ku berpirsên dewletê ji qebûlkirina van daxwazên kurdan ge-lek dûr in. Serokdewlet, Abdullah Gul, ev çend sal in ku behsa çareserkirinê di-ke, daxwaza duzimanan red kir. Gul bala kurdan kişand ku daxwazên wu-sa dibin sedema qedexekirina partiyekê. Sererkaniya ordiyê, bi daxûyaniyek fermî di internetê de helwesta xwe li dijî duzimanî anî ziman. Serokwezîr R. T. Erdogan, di parlamentoya Tirkîyê de daxwazên kurdan ji aliyê duzimanî

û xwesarî (otonomî) wek "provokasyon" şirove û red kir. Hemû berpirsên û sazgehên dewletê, li dijî bikaranîna du-ziman û mafên din yên kurdan, helwestek wekhev eşkere kirin. Mimkûn e ku dadgehên tirk li hemberê kurdan ji bona xebatên li ser duzimanan pêştetir biçin û cezayên mezin jî bidin şexsiyêten kurd.

Helwesta dewletê li hemberê bikaranîna duzimanan, bo çareserbûna pirsgirêka kurd jî gelek şaş e û dibe sedema berdewamkirina şerê çekdarî. Ji ber hikûmet û serokdewlet Gul salên dawî gelek caran behsa çareseriyê kirin û di vê warê de di nav kurdan de "hêviyek" çêbû. Hikûmeta AKPê hinek gavên nû jî avêtin. Lê ji aliyê din ve daxwazên kurdan wek "tehdîd" yan jî "provakasyon" dibînin.

Wek tê zanîn, serê sala 2009an di televîzyona fermî, TRT de bernameya bi kurdî (kanala TRT6ê) dest pê kir. Piştra di zanîngeha Mêrdînê de be-şa zimanê kurdî vebû. Di tarîxa Tirkîyê da ev gav bi rastî nû bûn. Qedexyên dewletê li ser ziman û çanda kurdî bi vî şiklî ji holê rabûn. Hikûmeta AKPê di vê warê de eşkere kir ku sîyaseta dewletê ya înkâr û gedexekirinê divê

bê rawestandin. Armanç û sebebên van guhertinên dewletê tu car nehatin ziman. Heta niha jî nayê zanîn, kîjan reformên ji aliyê ziman û çanda kurdî di rojê hikûmetê yan jî dewletê da he ne. Aspeketeke din ya balkêş ew e ku di tu dokumentên fermî da behsa kurdan û kurdî nebûye. Hikûmeta AKPê ev gav avêtin, lê bêqanûn û bêyî ku bi şiklekî rast van tiştan bi nav bike.

Li ser gavên TRT6ê û beşa kurdî, hikûmet qebûl bike yan neke jî, tesîrên pir faktorên hebûn. Yek ji wan faktorên helwesta Teverga kurd û têkiliyên Tirkîyê bi başûrê Kurdistanê re bûn. Daxwaza Yekîtîya Ewropayê (YE) ku ji salan vir de tê ziman, ji aliyê parastina û pêşvebirina zimanên mînorîteyan jî di guhertina sîyaseta dewletê de rolek lihîstin. Dewletên Yekbûyî yê Amerîkayê (DYE) jî daxwaza mafên çandî bo kurdan dianîn ziman. Tesîrên van faktorên Tirkîyê mecbûr kir ku gavan ji aliyê ziman û çanda kurdî biavêje.

Nakokîya sîyaseta Tirkîyê ya kurd, carekê din di nîqaşa li ser xweseriyê û bikaranîna duzimanî eşkere bû. Tirkîyê hîn ne amade ye ku mafên kurdan yê netewî qebûl bike û statuyek fermî bi kar bîne. Ji bona vê Kongreya Civaka Demokratîk (KCD) bîyarek derxist ku kurd êdî li benda gavên dewletê neskînin û bi xwe daxwazan bi kar bînin.

Şaredariyên ku di dest BDPê de ne, gavên duzimanî avêtin. KCD bi rêxistinên civakî re kampanyayek, ji bo ku kurdî bibe zimanê perwerdeyî, dest pê kir. Berê wê, cara yekem, kurdan hefteyekê dibistan bojkot kiribûn. Niha bi armanca bikaranîna duzimanan û mafên din, mîmkûn e ku sala 2011 di nav kurdan de bibe sala serhildana civakî.

Xebatên KCD û BDP yê duzimanî di rêya çareserkirina pirsgerê kurd de ji aliyê hemû partî û rêxistinên kurdan yê din jî tên qebûl kirin. PKK/ KCKê girîngiya van xebatan eşkere kir û piştgiriya dide. PSK û partî û rêxistinên din jî daxwazên li ser zimanê kurdî anîn ziman. Partiyên legal wek HAK-PAR û KADEP di nav xebatên ji bo kurdî cih digrin û piştgiriya bikaranîna duzimanî dikin. TZPKurdî, Enstîtuya Kurd ya Stenbolê û gelek komel û rêxistinên civakî yê din di nav kampanyaya zimanî kurdî de xebatê dikin. Qebûl kirin û bikaranîna kurdî bûye daxwaza hemû kurdan û di rojê Tirkîyê de ye.

Pirsa di rojevê de ew e ku çawa kurd bi daxwazên xwe ji aliyê zimanê kurdî ê bi ser kevin û hêza wan ji bo guhertina sîyaseta hikûmeta AKPê û dewletê heye? Bersîva vê pirsê bi gelek faktorên ra girêdayî ye. Di vir de rola navendê divê kurd bi xwe bilîzin û giraniya xwe bidin van faktorên.

• Divê kurd bi piranî di hemû beşên jiyanê de daxwaza zimanê kurdî pêk bînin. Serîhildanek pasîf û civakî ku hemû hêzên kurdan di nav de bin, nikare ji aliyê dewletê ve bê sekinandin. Êrîşên dewletê mîna operasyona KCKê ya 2007an li hemberê 1700 sîyasatmedarên kurd ê bê tesîr bibin û daxwazên kurdan ji aliyê nasnameya û zimanê kurdî hin jî xurtir bin.

• Di sala 2011an da hîlbijartinên parlamentoya Tirkîyê çêdibin. Di kampanya hîlbijartinan de pîrsa nasname û ziman mimkûn e bibe mijara yekem ya hîlbijartinê. Eger kurd dengên xwe bi piranî bidin partî û sîyasatmedarên kurd û AKPê bi vê şiklê protesto bikin, hêzên dewletê ê ji vê encamê dersan derxin û mecbûr bibin ku daxwazên kurdan qebûl bikin.

• Kurd di kampanya hîlbijartinan de divê guhertina makeqanûna Tirkîyê bo qebûlkirina nasnameya kurdî bikin mijara rojevê. Li her derê rexneyê sîyaseta dewletê divê bînin ziman û daxwazên kurdan bibe kriterê dengdayîna partiyan û namzetên wan. Hîlbijartina 2011an bibe sedema kampanyayek netewî bo nasname û zimanê kurdî. Ji bona vê jî îtîfaqa hemû kurdan pêwîst e.

• Kurdên dîyasporayê, berê wan yên li Ewropa, divê sala 2011an bikin sala kampanya bo mafê kurdî û xebatên civakî û dîplomatîk di dewletên

Ewropayê de bi pêş ve bibin. Daxwazên kurdan divê li cem rêxistinên YE de herdem bînin ziman. Kurd dixwazin he- ta Newrozê îmzeyan berhev bikin û bişînin Neteweyên Yekbûyî û YE. Divê kurdên dîyasporayê ji piştgirî bidin vê kampanyayê.

Astengiyên ku dewleta Tirkîyê dide ber kurdan, tê maneya berdewamkirina sîyaseta înkâr û asimilasyonê. Guhertinên li dinê û Rojhilata Navîn, li Iraqê û başûrê Kurdistanê, balkêş e ku hîn jî li Tirkîyê nayên ber çav. Daxwazên kurdan yê netewî ku navenda van da pîrsa nasname û ziman cîh digrin, ji aliyê berpirsên sîyasat û ordiyê ve wek "tehdîdek bo dewleta unîter" ya Tirkîyê tên famkirin. Dewletek pîrnetewî û pîrzimanî ku kurd vê daxwazê dikin, dikare bibe realîteya Tirkîyê eger kurd di dema pêş de di projeya duzimanî de bi ser kevin.

Di sala 2011an de armanca rojeva kurdan, duzimanî û bikaranîna kurdî wek zimanê perwerdeyê ye. Ev armanc ji aliyê çareserkerina pîrsgirêka kurd de him civakî, him jî sîyasî ye. Erdogan û berpirsên Tirkîyê yê din vê aspektê baş dizanin û nerazîbûna xwe bo çareseriyek li gora kurdan eşkere dikin. Divê kurd jî bi hev ra kar pêk bînin û dest ji daxwaza ziman bernedin, heta ku ev ji aliyê dewletê ve hate qebûl û îcrakirin.

# "Kurd hatin dibistanan toy rabûn"

Bîranîn û sohbetek bi Rifat Îlhan re

## Mem Xelikan

Kek Rifat ji kurdên Anatoliya Navîn e. Li bajarê Kirşehîrê, qezaya Çiçekdağê, li gundê Zekerê hatiye dinê. Dema ku dibistana navîn xilas dike, tê Ankarayê, li zanîngeha aboriyê bi navê, Ankara İktisadi ve Ticarî İlimler Akademisi yê(AİTİA) perwerdeya xwe berdeveam dike. Sal 1969-1970ê ye. Bi hevalên kurdistanî ve hevdu nas dikin. Dûre dibe endamê Komela xortên kurdan DDKOyê.

Kek Rifat li sala 1977an AİTİAyê xilas dike. Wek her xortekî wê wextê astengiyên cûntaya 12ê Adarê dikişîne. Dû efûya 1973an dema ku DDKD li Ankarayê hat damezirandin tev li hevalên rêvabir dibe. Li dema cuntaya 12ê îlonê ew jî wek her kurd û pêşverûyên tirkî para xwe digire. Kek Rifat bavê du zarokan e. Huro jî li Ankarayê wek "Mali Müşavir" kar dike. Ji bo fikir û dîtînen wî yê li ser kurdên Anatoliya Navîn û pirsgrêkên wan û çend sed sal in çand û zimanê xwe çawa paraztine... ez çûm cem Kek Rifat. Hevalekî me yî delal, kurdperwer û pêşverû, parêzger Yusuf Çakmak em kirin mêvan. Me hersêyan ji bo we heypeyvînek pêkanî.

– *Kek Rifat Merheba*

– Merheba, kekê.

– *Ez dixwazim pîrseke klasîk ji te bipîrsim. Rifat Îlhan kî ye?*

– Erê, birayê min. Ez, Rifat Îlhan.

Di sala 1949an de, li qeza Kirşehîrê Çiçekdağê, li gundê Zekerê ji dayîk bûme. Navê gundê me î niha "Yalnız Ağaç" e, gundê ku tirkî ji bo ku em kok û esilên xwe jî bîr bikin, ji bo asimilasyonê navê vî gundê ku min lê xewn dîtî, gundê ku ez lê zaroktiya xwe jîyam. Ya hûn bizanin bi kurdî maneya wê, "dara bi tenê" ye. Hen dar bûn. Em belikê li payîzê dihatin weşîn. Min dibistana yekemîn li Zekerê xwand. Wek her zarokêkî kurd, rastî zimanê tirkî hatim. Sinifa yekemîn, min xilas kir şu ve, tu mamoste nehatin gundê me. Salek şu va, mamosteyek hate gundê me Zekerê. Ji bo ku mamoste tunebû, min salekê navber da xwendina xwe. Dora dine salê mamosteyek hate gund. Lê min di salekê de tirkî ji bîr kiribû. Dixwaste ez herim sinifa duduyan. Lê ji bo ku min tirkî ji bîr kirîye, ez careke din şandim sinifa yekemîn.



Rifat İlhan û Mem Xelikan.

Min dibistana navîn li mala xaltîya xwe, li Yerköyê xwand. Sinifa dawîyê ez hatim Ankarayê dibistana bi navê Halide Edib Adıvar min xilas kir. Lîse jî, ez vegeŕiyam Kırşehirê. Min lîseya Kırşehirê xilas kir. Li sala 1969-70yê ez hatim Ankarayê, min dest bi xwandina zanîngahê kir. Li Ankara İktisadi ve Ticari İlimler Akademisi (AİTİA), sala 1977an min beşa aborîyê xilas kir.

– *Kekê navê malbata we çi ye?*

– Em Şêxbilî ne. Li Kırşehirê, 12 gundên Şêxbilî hene. Ji xeyrî wana, Mîfkî, Bereketî, Oxçî, molikî... hwd eşîrên kurdan hene. Giştik girêdayîyê Reşîya ne.

– *Li herema Konyayê Canbeg, Şêxbizîni jî hene.*

– Na, kekê li cem me Canbeg û Şêxbizîni tunene.

– *Tu dizanî, ew aşîranan ji kêderê hatine?*

– Welle, ji bo dîroka wan ya koçberîyê tu belgeyên nîvisandî tunene. Mezinên me digotin "Em ji welatê jêrî hatin e." Welatê jêrî, heremeke berfireh û fere ye. Antep, Riha, Helep û Mûsul jî dikeve nêva wê heremê.

– *Kek Rifat, bi dîtina te kurdên Kırşehirê, ziman, çand û kultura xwe parastine an na? Bi fikira te, parastine xerê çing parastine?*

– Erê, parastine. Wana jî wek kurdên din, li Anatolîya Navîn dijîn, Çand û kultur û zimanê xwe parastine. Bi erf û edetên xwe jiyane. Kok û eslê xwe qet ji bîr nekirine. Edebiyata xwe ya devkî, folklor û jîyana xwe bi kêmasî be jî gihandine huro. Mêran tirkî li leşkeriyê hu kirine, mêrên berê. Jinan tirkî nedizanîn, hetanî 50-60 salî berê. Kekê ez ji te re tiştêkî bêjim. Mezinan digotin "ji bo ku jinên me tirkî nizanine, etarên tirk dihatin gund ji bo ku

bikanin bi jinan re deng bikin û tiştên xwe bifiroşin, ew kurdî diêvisîn."

– Kek Rîfat, huro li gundên we xelk bi kurdî an jî bi tirkî deng dikin?

– Welle çi derewê bikim kekê, mezin bi kurdî, lê mixabin xort û zarok bi tirkî deng dikin.

– Kek Rîfat, dixwazim pirseke dû-dirêj ji te bikim. Kekê bi fikira min kurd, gerek ji bo asîmîlasyonê, gerek ji bo aborîyê û gerek jî ji bo pirsgirêkên din anîn li Anatolîya Navîn bi cî û war kirin. Lê mês dikim, ew negêhiştine armancên xwe. Çima negêhiştin armancên xwe? Li Anatolîya Navîn, kurd di heremeke weng da dijîn ku di navbera wana de tirk pir di kêmasîyê de ne. Kurdan têkilîyên xwe û jîyana xwe bi xwe pêkanîne û jîyane. Em dibêjin zi-

man çing parastine? An jî ew çanda çawa gihandin huro? Hetanî sala 1950–60î tu hewcetîyê kurdan bi zimanê bazarê, yên bazirganîyê û tirkî nebû. Û hetanî salên min li jor behs kirî, kurd û tirkan tu bûk ji hev negirtine û kurdan tu keçên xwe nedane tirkan. Vaya ji bo parastina zimanê dayîkê bi min girîng e. Ji bo vê gotina min, fikirên te çi ne?

– Erê, birayê min, gotinên te bi min jî rast tî. Mîna ku te gotî, li Kırşehirê jî weng bû. Li cem me jî wisa ye. Keçên xwe nedidan tirkan û lavên xwe ji tirkan nedizawicandin. (Li cem tirkan jî weng wû.) Vaya, li cem kurdên Kırşehirê eyîb dihat dîtî û şerm bû. Lê mérékî mezin, xanima wî rehmetî bûya hingê ji malbatên tirkan jin dianîn. Ez ji te re vê jî bibijim, pir keçên Kırşehirê bûkên



Rîfat İlhan û çend hevalên xwe yên endamên DDKD.



Rıfat İlhan.

kurdên Konyayê hene. Li cem me jî keçên kurdên Konyayê hene ku bûne bûk û hatine Kirşehirê. Vaya jî wek te gotî, kurdan di navbera xwe de wek ji welat hatin, di navbera xwe de jiyana domandine. Ya ku huro em li ser linganî, kî dizane, dibe ku çand û kultur û ziman weng hate parastin.

– Kekê, mezinên me digotin: "Dengbêjên ji Kurdistanê dihatin, ji bo ku em esil û koka xwe ji bîr nekin, pir keda wana jî ji bo parastina zimên û kultura me bûye." Tu ê ji bo vê çi bêjî?

– Erê, kekê... dihatin herema me jî. Wek te gotî, Keda wana jî pir e. Ji bo ku xwe înkâr nekin û çanda xwe bi hev re bijîn, wana roleke mezin lihîstine. Navê wana ji bo ku ez zarok bûm nayên bîra min. Ez tenê navê Hecîyê Quriş dizanim. Hecîyê Quriş dîroknas bû. Dîroka malbatan dizanî. Ji Antep

Arabanê dihat. Lê bira ez navê dengbêjên ku dihatine Kirşehirê nas nakim. Bavê min î rehmêtî, wexta ku bi me şa dibû, ji me re lorikên weke:

*"Kinê kinê kina kê*

*Ez dirêjim tu qutê"* digotin. Wî vava ji wana dengbêjana girtibû. Lê mixabin, ez dawîya wê nizanim.

– Kek Rıfat, ez li sala 1967an hatim Ankarayê, ji bo xwendinê. Tu jî dizanî, wê wextê herkes diçû cem merîyê xwe. Bavê min jî ez şandim cem bixaltîyê min. Parêzger (Avukat) Alî Çakmak. Sal 1967 bû. Wê demê tu, li Ankarayê li zanîngahê (AİTİA) wûyî. Dema ez hatim Ankarayê, min xwe tirk dizanî. Yê em perwerde kirin, mamosteyên ku hatinî gund, ew bi ber me xistibûn. Lê dû cuntaya 27 Gulanê, dema ku li dinyayê û Tirkîyê mafên gelan bi pêş ketin, kurdan jî ji bo xwe û mafên neteweyî xebat çêkirin. Wek xebata 49an û DDKO.



Sala 1975 an, nijadperestên tirkan endamên "Ülkü Ocakları" Ali Aslan, qurşîn kiribûn. Rıfat İlhan û çend endamên Ankara DDKD li nexweşxaneyê li cem Ali Aslan in. Rıfat İlhan yê li hêla lingên Ali ye.

*Wê demê hevalên kurd yên herema me li zanîngahan bi şagirtên kurdên Kurdistanî ve têkilî çêkirin û hevdu nas kirin. Kurdên Anatoliya Navîn yên li zanîngaha kok û eslê me bi me dan nasandin. Kek Rıfat, pirsê min pirsgirêka kurdan kengî bala te kişand û tu nêzî wan bûyî?*

– Min xwe tu carî tirk nehesiband. Li dibistana yekemîn jî. Wek her zarokêkî kurd, min jî tirkî dema dest bi dibistanê kir êvisî. Mamosteyan, ji bo ku sitran û marşên tirkan bi me bidin êvisandin, ji şagirtan koro pêk tanîn. Çavê mamoste tim li ser min bû. Min nedixwast ez wana bêjim. Mamoste, dizanî lêvên min nalivine. Ji bo wê jî min pir kut xwarin.

– *Vaya ji ku dihat?*

– Bi bawerîya min, ji malbata me dihat. Ez bi kultura kurdan mezin bûm. Malbata me dewlemend bû. Ji malbatê pir xortên xwanda hebûn. Mezinên min ên xwanda zêde wûn. Tesîra wana li ser min hebû.

– *Pirsgirêka kurdan kengî bala te kişand?*

– Ji dibistana navîn de em şagirtên kurd me bi hev ra hevaltî dikir. Dema me li bajaran mal digirtin, hevalên kurd tev li malekê diman. Me bi tirkan re qet hevaltî nedikir. Dema em bi serê xwe diman, li mal jî û li dibistanan jî me bi zimanê xwe deng dikir. Ez li lîseyê di sinifa sisîyan de bûm. Di dersa sosyolojiyê de bi tirkî toy (şölen) digirtin. Hevalekî tirk got: "kurd hatin di-



bistanan toy rabûn." Min jî jê re zêf kirin. Çû ez bi midir şîkat kirim. Midir jî hat li sinifê "Hen hevalên we, xwe kurd dizanine. Ew ne rast e. Bi navê kurd, tu millet tune. Em hemû tirk in. tirkên li çiyar dijîn, dema berf pir dibû wana li serê çiyar pêle berfê dinan, dengê qart-qurtê dihat derê. Wana ji xwe re kurd digotin." Di sinifê de jî, ez û Mistefa Beydoğan tenê kurd wûnî.

– *Kekê, navê dibistana Kirşehirê ya mamostatîyê min pir bihîstîye. Û gelek merivên weletperwer û pêşverû ji wira mezûn bûn. Wê dibistanê tesîra xwe li ser te jî bû?*

– Na, dema ku hevalên Kurdistanî anîn li wir bi cih kirin, ez li Ankarayê li zanîngahê bûm. Ewana sala 1971an hatin. Rehmetî Seyit Alp, li dibistanê mamoste bû. Havalên wek Bayram


Ayaz, Halim İpek... hwd, ji wira mezûn bûn.

– *Tu kengî tev li komelên kurdan bûyî?*

– Ez sala 1969an ji bo zanîngahê hatim Ankarayê. Me hevalên Kurdistanî naskirin. Ez sala 1970yî bûm endamê DDKOyê. Wê wextê ji herema me İbrahim Güçlü serok wû, di girtigehê de bû.. Cemal Beydoğan, Mistefa Beydoğan, ji Gazî Egitimê Hatice Yaşar, dihatin diçûn.

– *Dema doza DDKOyê tu jî hatî binçav kirin?*

– Na, wîngê em hê endam bûnî. Ne rêvabir bûnî. Me bi hen hevalan ve bultena DDKOyê belav dikir. Me dibir Kirşehirê jî. Lê ji bo doza DDKOyê, ez qet nehatim girtin û binçav nebûm.



Rifat İlhan û İsmet Ateş.

– Kekê, dû cuntaya 12ê adarê ve sala 1973an şûva, kurdan carek din bi serê xwe komal damezirandin. Wê wextê te tev li kê kar dikir?

– Me, li Ankarayê DDKD damezirand. Û min bi wan hevalan ve siyaseta demokratik û çandî dikir.

– *Ewqasî dizanim ku tu rêvabirê DDKDya Ankarayê wûyî. Belevoka damezirandinê we nîvisandibû. Ji bo wê tu û hevalên te, hûn hatin binçavkirin û bi biryara DGM hûn hatin heps kirin. Ji kerema xwe re tu ê, bîranînên xwe yên wê wextê bi me re par ve biki?*

– Me di wê belevokê de navê kurdan derbas nekiribû. Lê me gotibû: "T.C. ne dewleteke homojen e. Dewleteke heterojene. Di zagonên dewletê de tenê mafê gelekî (tirk) pêşta çûyî-ne. Gelên din tu mafên xwe tunêne.

Zagonên dewletê ji bo wana paşverû ne. Gelên li ser vê axê dijîn, ji xeyrî tirkan tuneyî dihesibîne." Ji bona van gotinan, gotin hûn kurdayetiyê dikine. Em ji bo wê hatin binçavkirin û em 3-4 mehan di girtigahê de man.

Me wê demê parastina siyasî da. Di pirtûka xwe ya bi navê ..... de ji Îkram Delen navê wan hevalana dipirse. Lê Îkram navê wana bi kêmasî dayîne. Tev li wan hevalana: Hamit Geylani, Mustafa Nuri Aksakal, M. Ş. B. Ş. Rüştü Mütevellizade, Ahmet Göksoy jî hebûn. Navê min jî, Rifat ..... dayîye.

Kekê te got: Bîranîn. Hevalên me ku DDKD damezirand, parêzgerên me yek bû. Lê hevalên tev li biryara parastina siyasî nebûyîn ji xwe re, Uğur Alacakaptan parêzger girtin û parastineke ji me cûda kirin. Parastina wana



Rifat İlhan û Parêzger Yusuf çakmak.

ne sîyasî bû. Qe ji bîr nakim, parastina vî cêmerî bingeha xwe nijadpêrestî wû. Ji serokê dadgehê re got: "Vana hê zarok in. Nizanin çi dikin. Vana hê xwe, kurd dibînine xerê, vaya ne sûtê wana ye, sûtê dewletê ye. Ku dewletê, hê kurdatiya wan bi wana jibîrkinin neda ye." Ya tu bizanî, ez huro wê gotinê wek Uğur Alacakaptan ji dewletê re digot, we asîmîlasyon wek em dixwazin bi cîh neanîye, dihesibînim.

– *Dû 12ê Îlonê te ji bo sîyasetê çi kar kir û huro çi karî dikî?*

– Dû 12 îlonê, carekê ji bo dadgehkirina navenda DDKDê, carekê jî bi şaşitiya dewletê bi hevalên Rêya Azadî re ketim hepsê. Dû ve jî min pir aktîf sîyaset nekir. Lê tu caran ji hevalên xwe yên sîyasî bi dûr neketim. Huro jî weng e.

– *Ditin û dexwazên te yên li ser kurdên Anatolîyê çi ne?*

– Bi fikira min heta nuha tu daxwazên kurdên Anatolîyê nebûne. Hetanî huro jî kok û eslê xwe ji bîr nekirine. Vaya tiştêkî baş e. Ziman, çand û kultura xwe parastine. Vaya dilê min şa dike. Bi ser ewqas asîmîlasyonê de, hê li ser kurdayetiya xwe mane. Lê her yek di navçeya xwe de jiyane û bi serê xwe mane. Tu têkilîyên wana ji bo mafên netewî, kesayetî û demokratîk bi civakê re nebûne. Li van salên dawî, ji bo mafên min li jor hejmartî, bi kêmasî be jî daxwaz û xebatên wan hene. Bi fikira min, demokrasîya Turkîyê çiqas pêş va here, daxwazên wana jî yên ewqas werin holê.

– *Kekê, ez nivê pîrsa xwe ya jor dubare dikime. Li pêşerojê sewê parastina zimên ji bo azadiya kurdîtîyê li nav kurdên Anatolîyê çi hewldan, sazî û dezgeh gerek in?*

– Daxwazên merivan hene, dixwazê ne tenê bi serê xwe bin. Helbet daxwazên kesayetî jî hene. Lê li pêşerojê ku em dixwazin mafên xwe yên netewî biparêzin, gerek daxwazên me yên netewî û civakî jî hebin. Ji bo wê jî kovar û komeleyên civakî yên bi serê xwe hebin. Zimanê wana zimanekî perwerdê be. Yek jî ya ez dixwazim her kurdekî zana û ronakbîr bi zimanê xwe biaxife, bixwîne û bînivîsîne. Li malên xwe bi malbatên xwe re, li derva bi cîran û hevalan re bi kurdî biaxifin û deng kin.

– *Kovara Bîrnebûnê, dixwîni û çing dibîni?*

– Min pir Bîrnebûn nexwand. Çend hejmarên ku bi dest min ketin, min xwandin. Di malperê de jî min çend nîvis xwandin. Bîrnebûn li Awrûpayê tê weşandin. Bi fikira min, li vir were weşandin hê baş dibe. Bîrnebûnê pir tiştî baş kir. Lê gerek e êdî lêkolînên zanistî û profesyonelî jî têde zêde bîn weşandin.

– *Mala te ava be! Ji bo vê sohbeta xwaş. Li dawîya vê sohbetê, tiştêkî dinî tu bêjî heye?*

– Ez jî ji te re spas dikim. Hevalan bi baran silav dikim. Ji bo xebat û karê we serketinê dixwazim.

– *Spas.*

## Dîroka kurd û Kurdistanê

Şakir Epözdemir

### Di pêşîya împaratorîyeta medan da dewletên kurd

Dewletên Kurdan ji B.Z. 2700 salan bi Gotiyên (Gutî, Guttm) dest pê dikin. Di pêşîya vê dewletê da jî Dewleta Lolo'yîyan 2800 sal beriya ji dayîk-buyîna Hz. Îsa hatiye avakirin. Mîtani, di B.Z. da 1600 sal dewleta xwe damezrandine û li Suri, Kurdistan, Emûriyê û welatên Asûriyan hikim kirin e. Hezar sal hikmê vê dewletê dom kirî ye. Ji herêma Hilwanê heya Zawê di binê hikmê wan da bûye. Şerê wan tim bi Asûr û Akad'an ra qewimî ye. Herêma Silêmanîyê, Şehirbazar, Sexan, Zehawe, Kerkûk bajarên vê dewleta hezarsale bune. Paytextê Lolo'yîyan Zimrî'ye. Di dervayê van da Karduk, Huri, Kasî, nayrî û yê din jî dewletan ava kirine û muhra xwe li ruyê vê dinyayê dan e. Van salên dawîyê îdî nayê inkarkirin ku Dewletên Xaldîyan û Urttoyîyan jî dewletên Kurdan in. Heya berîya 50 salan jî ermen, tirk, ereb, faris tiştekan jî kurdan ra nehiştibûn. Çewan li ser qe-dera me rûniştine, her wisa hemî heyî û nixên me yê dîrokî inkar kirine û bi neweyî payê xwe xistine. Ezê niha bi

taybet ji bona biçûkên kurdan, Çîroka kurdan binivînim. Dîrok jî wey çîrokan e. Gelek xweş e. Meriv bi kûranîya zeman û meknan va berjêrkî dibê. Çewa ku meriv bi hezarsalan li dinyayê jîyabî, çewa ku umrê meriv bibe hezarsal, hewçend meriv dibê xwedan tecrûbe û exlaqên giranbaha. Dîrok, şexsiyete dide miletan. Merivê ku dîroka xwe nizanibin û hayê wan ji dîroka dinyayê tinebin, ew insan weka kûşîka ser avê sivik û vala, ji xwe ra direqisin û tişteke sererast ji dinyayê fam nakin.

**Împaratorîya MED, (Beri Zayînê 650):** Milet û êl û eşîret, di rojek da nabine dewlet û rojek da nabine împaratorî. Berîya ku bibine dewlet û Împaratorî, gelek qonaxên dûr û dirêj derbaz dikin. Hemî kes dibêjin ku şerê Kurd û Asûriyan 2000 sal domandî ye. Ma Asûriyan bi kurdên bê dewlet û bê sînor ra şer dikiran? Camêran kevîran kolane û berxwedanên kurdan li zinaran xaz kirin e. Li ser wan zinaran behsa lehengiya kurdan kirine. Medan, berî zayînê di 650 yê da Împaratorîya xwe ava kirine. Gava ku neviyê Astyages ku

navê wî Kyros (Kuroş ango Kurroj + Kurê Rojê) buye û Faris e, ewî inqilab li kalikê xweyê kurd kir, wî kalikê xwe yê bê weled ji text anî xar û navê dewletê kir ‘Pers’ ango ‘Pars’. Lê ev dewlet dîsa dewleta berê ye û gelek erd û axên din lê hatîye zêdekirin. Heya sala B. Z. 330 yê ku Îskenderê Mezin hat bû belayê serê kurd û Faris û hemî Mezopotamiyên jêr û jor, ev yek waha dom kir. Di navbera kurd û persan da rêvabirî, pêşengî, dihata guhertin, dewlet dîsa dewleta kurd û Parsan bû. Ji beri Hz. Îsa 650, heya 520’ê, kurd hâkim’in. Ji 520 ê, heya 330 yê Parsî hakimîn. Ji 330 yê heya Fetha Îslamê kut ê dighê Pişti Mîladê 640ê û dike nêzi 1000 sal, Bizansîyan û Romayîyan qirşikek ango pulek bi kurdan nedan e. Cemil Çiçek û Bahçelî bi kîjan çavî li kurdan mêze dikin, wan çîqrûtên Rom û Bîzansan jî bi wî çavî li me mêze kirin e. Îslamê, bi taybet Kurdîstana Bakûr jî binê destê wan zaliman rizgar kir. kurd û Îslam zû li hev hatin. Bandora Bizansîyan li ser kurdan, jî rexê Serhedê va heya 1071 ê ku şerê Alpaslan û Diyojen qewimî domand. Li Melazgirê pişta wan zalimên Romê şikest. Xaçperestan xwe heya wextê Eyyûbiyan jî di kurdan da xwirandin. Belayeke ji belayê wan diwartir û dirêjtir, di tû demê da nehatîye serê kurdan. Ji Îskenderê Mekadon heya serpêka Îslamê şîrikayetîya

kurdan bi Partan ra, bi Hurkanî û Aşkanîyan ra, bi taybet bi Sasaniyan ra qenc xerab çêbûn e, evan dewletan jî weka dewletên med û persan bi kurdan ra û bi Mezopotamiyayîyan ra dewletên mişterek bûn e. Dibêjin Qralên Sasaniyan bi eslên xwe kurdin; lê ez rast nehatime ku ‘Roma Reş’ di tû der û delavî da rolek dabe kurdan. Destikên wan û ezîzên dilê wan Gurcî, Ermenî û Filleyên hevalên wan bûn e. Evan Mesîhîyan, di wî zemanê dûr û dirêj da gelek dafikan di pêşîya kurdan da vedane û keysa wan li miletê kurd hatî ye. Çi jî destên wan hatîye anîne serê kurdan. Niha xebereke kurdan heye ku weka ‘idyomê’ tê gotin: “keys fileti”. Keysfiletî navê bêbextiyê û nîşana bêwefayî û şîrheramiyê ye.

### Dewleta Şedadîyan (951–1164)

Muhemmedê Kurê Şeddadê kurê Kurto, li ser navê babê xwe Şeddad sala 951ê li Arran’a Azerbeycanê vê dewleta pîroz ava kir. Ev dewlet heya sala 1199ê dom kirî ye. Selçuqîyan di sala 1075ê da midaxela vê dewleta kurdan kirine, lê careke din kurdan xwe dane hev û paytextê xwe kişandine Bajarê Anî yê. Duwîn, Gence, Qerebax, Nehciwan, Demirkapî Tiflîs di binê hikmê Dewleta Şedadî da bû ye. Sinorê Dewleta Şeddadiyan demek bajarê Meletê jî girtîye hindirê xwe. Piştra xwe gihan-

diye Derya Reş. Hikmê Şeddadiyan ji 220 salan bêhtir dom kirî ye. Di warê bajarvanî, çand û îmaratan da gavên berketi avêtine. 20 heb hikimdarên li vê dewletê hikim kirine. Di zemanê Hikimdareke bi navê Şawirê babê Ensar ku 18 sal maye li ser hikim da gelek xizmetên giring pêk hatin e. Niha jî di muzexaneyên Gurcistanê da 'Deriyên Genceyê' ku kurdan di zemanê Şawir da çêkirine raxistî ne. Ew Pira navdar ya li ser Çemê Arasê ya bi navê Xudaffer di zemanê Hikimdarê Dewleta Şeddadiyan Fazl da hatîye avakirin. Dîsa li Bajarê Qersê, li xirab bajarê Anî yê ku ev bajareke qedîm û entîke ye, 2 eserên Şeddadiyan ciyên xwe girtine. Sala 1072 yê ev dewlet bi navê Gence û Anî bune 2 şeq. (ango şax). Ev dewleta kurd li ser esasê Îslamê hatiye avakirin. Tim micadela vê dewleta kurd bi Ermen, Gurcî, Bizans û Urisan ra buye. Serê ewil peytextê vê dewletê Dabil (ango Duwîn) buye. Piştî hingê Gence buye nawenda wan. Wê demê Herêma Arran di binê hikmê eşîra Rewadiyan da buye. Nehcîvan, Gence, Berba, Dubeyl û Beylekan (balekan) diketa nava tixûbê wan. Li qibleyê wan Aras û li bakûrê wan Çemê Kura diherikiya û heya Derbendê di bin hikmê wan da bû. Romayî û Helenî'yan welatê wan bi navê 'Albanya' nav kirine û ji qewmê vê herêmê ra 'Aryan' gotine. Ew 'Aryan

e ku piştra buye'Arran'. Bajarê herê bi nav û deng û nawenda ticaretê bajarê Barda yê bu ye. Ev bajar bi taybet di warê hevrîşim çêkirinê da gelek dewlemend buye. Sala 944ê Uris û Vîking (Îsweçî + Swêdî) ji rexê bakûr va hatine bi ser vî bajêri da girtine. Wê demê ev bajêr di bindestê Deylemiyan da buye.

### **Dewleta Hesenweyhiyan (Hesnewîyan): (959–1139)**

Di sala 959 yê da ji terefê Serokê Eşîra Berzekaniyan Hiseynê kurê Hesên li ser navê babê xwe Hesên, dewleta Kurd ya Hesenweyhî ava kirî ye. Şehrezor, Dînawer, Hemedan û herêma Nîhawendê di binê hikmê vê dewletê da buye. Paytextê vê dewletê Bajarê Sermaçê ye. 171 sal ev dewlet jiya ye. Ebbasiyan Artêşeke giran şandîye ser wan, ewan bê ku pozê yekê xûn bikin û qetilxûn biqewimînin wê artêşa giran mecbûr kirine ku ji ser welatê wan bikişê herê. Piştî ku serxwebûna xwe bi dest xistine û aleya azadîyê bilind kirine, di warê pêşvaçûyîna welatê xwe da xebitîne û him di warê aborîyê da, him di warê xwendin û perwerde û leşkerîyê da gelek bi pêşketin e. Welatê wan him serbixwe û him welateke aram û dewlemend buye. Çi imkanên ku ketine destê wan, li gelê xwe xerc kirine û bi şev û roj xwe dane xizmeta xelqê xwe. Rêvebirên dewletê weke şovelyan cengawer û merd û

xweşmeriv bûne. Xelîfeyê Bexdayê bi navê Nasiruddewle wan bi nav kirîye. Gelek serkeftî bûn e. Ewan gelek bi merdemêranî 171 salan dewleta xwe meşandine û navên xwe bi qencî ji wî zemanî heya vî zemanî hiştine.

### **Dewleta Buweyhîyan: (934-1050)**

Ev dewleta kurd di sala 934 ê mîladî da ji terefê Elî Hesen û Hüseyin Ehmed va li Îranê hatîye avakirin. Şîraz, Esfexan û Hemedan di binê hikmê wan da bû ye. Xelîfeyê Ebbasiyan yê wê demê mecbûr kirine ku serxwebûna vê dewletê bipêjirîne. Evê dewletê gelek mizgevt, medrese, xan û pir û nexweşxane û qesr û qonax û bajarên ava kirine. Bîrên avê vedane û xizmetên berketî pêkanîn e.

### **Dewleta Hemdanîyan: (944-1039)**

Li Herêma Helebê Ev dewlet sala 944 ê mîladî hatîye avakirin. Heleb û Musul di binê hikmê vê dewletê da buye. Paytextê wan Bajarê Helebê ye. Ji bo Mezopotamya jorîn bikin bindestê xwe şerê Qralê Bîzansiyan Romanos kirine û bajarê Urfa yê jê sitandine. Piştî kû Romanos mexlûb kirine hemi erda Suriyeyê ji ketîye binê hikmê wan. Di warê xwendin û perwerdeyê da dewleteke pêşketî ye. Di zemanê rêvebirîya vê dewleta kurd da alim û şair û Wêjevanên weke El Mutanabî, Ebû Firaz û Ferrabî rabûne.

### **Dewleta Alamût ya Ziyarîyan: (930-1071)**

Merdewîç ê kurê Ziyar ku ji eşîra Deylemîyan buye, sala 930 yê Mîladî li ser destê wî, li bakûrê Kurdistanê ev dewleta bin av û deng hatiye avakirin. Teberistan û herêma Curcanîyan di binê hikmê vê dewletê da bû ye. Çewan ku dîrokvan dibêjin ji Esfexanê heya El-Cezîreyê û Îrak heya Qafkasan di binê hikmê wan da buye. Ev herêma Deylemîyan di serê sedsala 9 yê da Misilmanîyê pejirandî ye. Ev kurd li Başûrê Rojavayê Derya Hezarê gelek hêzdar bûn e. 141 ango 179 sal li ser pîya mane û 8 hikimdarên vê dewleta bi tedbîr û rêzik hev guhartine. Hesen Sebah ku him di warê manewî da û di warê rêvebirina dewletê da gelek serkeftî buye, li serê çiyayên kurdan evê dewletê anîye dereceyeke wisa bilind ku navê vê pêşketinê û xweşkirina welat ji terefê ereban va danîne cenet (Behîşt). Mezhebê wan 'Îsmailîye' ye. Marko Polo ji bo vê dewletê gotîye: "Hesen Sabah li serê çiyayên bilind Behîştê aşiq û maşûqan, ya şalûl û bilbilan û bextewaran di nava wareke aram û azad da avakir. Ew xwedîyê xizneyeke gelek zengîn bû. Ji ber avakirina vê ceneta rengîn di nava zemanê kin da di nava mîletên Îslamê da gelek terefdarên wî (Hesen Sabah) çêbûn û bi hezaran xortên Misilmanan qesta vê ceneta rengîn kirin.

**Dewleta Merwaniyan:** (985-1096)  
 Ximdarê vê dewletê Bad (ango Baz) e. Bad, Hikimdareke gelek zîrek, mêrxas û Adil e. Siyasetmedar û şervaneke mezine. Artêşeke wîyê gelek xwurt hebu ye. Dibêjin ji Xarpêtê rabuye, Diyarbekir anîye ser benda xwe û Farqînê kirîye paytext. Ew her di nava artêşa xwe da buye û di mideteke kurt da erda xwe fireh kirî ye. Serê pêşî, Erdîş û Melazgirê heya Cizîrê xistîye binê hikmê xwe. Ji bilî Misilmanan, hemî bawerî û nijadên nava welat jêra rîayet kirine. Wî jî fiq û meylê nexistîye navbera welatîyên xwe. Bad hikimdareke gelek adil û dildar buye. Qima hemî welatîyan pê hatîye û xwe spartine wî hikimdarê meriverwer. Dibêjin hinek kurd bajarê Musilê talan kirine, Bad şerê wan talanbîran kirî ye, malê Musilîyan ji wan standîye û li xwedîyê wan dagerandî ye. Di şereke giran da xwe ji ser hespêk avêtîye ser hespeke din, tera buye, piştî xwe şikandîye û sala 997ê da mirî ye. Gava mirîye sînorê dewleta wî ji Çiyayê Cûdi heya Xarpêtê, ji rexê din va heya Hekkarî û Melazgirê ye.

Piştî Bad (Baz) xwarzyê wî Ebû Hesênê Kurê Merwan ketîye cîyê wî. Babê Hesên, sistema dewletê bi rengeke hemdemî saz kirîye, navê babê xwe Merwan daye dewletê. Piştî Ebû Hesên birayê wî Seîd derketîye ser text, sala 1011 ê Ehmed Merwan jehrê daye yê,

wî kuştîye û derketîye ser text. Ahmed Merwan ji Kormas'a Şêrwan'a Sêrtê ye. Evî hikimdarî 52 salan li vê dewletê hikim kirî ye. Firqa tû ol û mezheban nekirî, tenê ne ji insana, ewî ji heywanan jî hez kirîye, dibêjin gava zivistan dijwar diborîyan, goşt û genim û kût û pûtê li serê çîyan li ser befrê dida rastkirin ku heywanên kûvî ji birçîyan nemirin û qir nebin. Di zemanê hikimdarîya wî da, bi dewamî genim li feqîran hatîye belavkirin.

Di zemanê Nasiruddewle da, Amed û Farqîn buye nawendeke dewlemend ya xwendin û perwerde yê. Misilman û xeyrê Misilmanan di zemanê wî da serbest û bi piştgirîya dewletê gelek gavên pêşketî avêtin e. Îlimdarên gelek navdar ji Şiîyan, ji Mesîhîyan û ji Misilmanan di dema hikmê wî da rabûne. Sala 1963 yê vefat kirî ye. Ahmed Merwan hêja ye kû pirtûk li serî bêne nivîsandin. Piştî mirina wî, heya 1087ê ku Selçûqîyan dawî li vê dewletê anîn jî, Merwaniyan hikmê xwe domandin. Ewan heya 1096 ê li ber xwe dan û xwestine vê dewletê ji dagirkeran paşde bigrin lê ya wan neçuye serî. Biyanî li ser axa me bûne dewlet, di koşk û serayem me da rûniştine, em weka êtîman mane li ber destên wan. Bindest heya bindest bin rojên xweş û geş û aram nabînin. Divê Milet bibin yek, nîrê bindestîyê rakin û qedera xwe bi destê xwe bigerî nin.



## Dewletên Eyyûbîyan

### SÎLTANÊ MEZÎN

Siltanê min şêr e, Li ser textê zêr e,  
Şehnazi ji me ra, Keda wî j'xelqê re...

Wî ereban nas kir, Ewî wan xilaskir,  
Dît ku pir bêbextin, Serê wana tas kir.

Ew tarê reş tarî, Ewî kir diyarî, Go:"-  
Ev remza we ye, Nîşana barbarî..

Hun hîç ne hêja ne, Ya min bo  
Xwuda ne, Bo Şerefa Ahmed, Qenc û  
Çaryara ne.

Ezim şêrê çîyan, Serdarê ewlîyan,  
kurdê Kurdistan im, Şûnwarê  
Nebî'yan..

Qewmê Îbrahîmin, Em kurdên  
qedîmin, Ji Zerdeşt ta Ahmed,  
Xwedan ol û dînin.

Xald, Urart û Med'in, Merwanî û  
Şed'in, Emjî xwedan erdîn, Bajar û  
Beledin..

Şar û şaristan'in, Bi deşt û  
zozan'in, Ewladên Ristem'in, Nesla  
Noşîrwan'in..

Ka bêjin hun kî ne, Bê şal û derpî  
ne, Ne j'bo Pêxenber bî, Kes li we  
nameyzîn e."

Di mijara Selaheddînê Eyyûbî da û  
xanedaniya malbata wî da, hemû xelk  
û alem dizanin ku ji 10 yê bêhtir Dew-  
letên Eyyûbîyan li ser destê vê malbatê  
hatine avakirin. Li ser axa Kurdistanê jî  
dewleta Farqînê û Hesenkêfê, ne xelete  
meriv ji wan ra bibêje 'dewletên Kur-  
distanî'. Ji xeyrî vê jî Bajarê Amedê,

Ruha'yê, Nisêbînê, Xelatê, Musilê,  
Erbilê ketine binê hikmê wan. Ew li  
Misrê û Şamê, ango li Yemen û Tinûsê  
bin jî, siya wan û siyaneta wan daye  
ser Kurdistanê û sehwa wan ketiye dilê  
neyar û despot û talanker û çavneba-  
ran. Siyaneta kurdan bi wan bilind  
buye û vaye 800 sal bihorî, lê hêja jî  
sênc û siyanet û şehnazîya vê malbata  
mezin ji me kurdan ra serbilindîyekê  
bê henpa ye. Em bi Siltan Selaheddîn  
serbilindin, şehnazin û heya roja heşrê  
wê ev serbilindîya me bi Siltanê Mezin  
dom bik e.

Xizmeta vê xanedaniyê gihaye hemî  
derên ku wê demê Misilman li dijîyan.  
Ewî cesareta xaçperestan şêkênand.  
Henbana vîr û derew û kerametên ruh-  
banan dirand û Ewropayîyan bi çavên  
xwe dîtîn ku miletên Misilman û xa-  
sima kurd, ne kêmtî wanin û şowalye ji  
kurdan jî radibîn. Her wiha Qenciya  
Eyyûbîyan giha xaçparêzan jî. Bi taybet  
ewan ji Siltanê Mezin dersên meriv-  
perweriyê, merditî û camêriyê girtin û  
careke din heya şerê cîhanê yê yekemîn  
nekarîn pîyên xwe dirêj kin û çalêmê li  
ser axa Misilmanan bikin.

Jiyana Selaheddîn Eyubî di şerên di-  
jwar û giran da derbas bu. Lê wî gelek  
eserên dîrokî dane avakirin. Gava ku  
Siltan Misir girt, li vêderê hîç Med-  
rese tinebûn. Lewra mezhebê dewletê  
li gor Îmamê (şî'e) bû. Ji ber vê siya-

seta dewleta Fatimî hewcedarîya medresan nediditan. Siltan, Medreseyek nêzî gora Îmamê Şafi'î ava dike. Dîsa li Meşheda Hz. Hiseyn xwendegehêk ava dik e. Xwendegehêk ya Henîftîyan dixê xizmetê, her waha Xwendegehêka Misrê ya navdar bi Medresa Zeynel Ticar va ava dike. Dîsa li Qahîreyê nexweşxaneyek di nav qesrê da ava dik e. Li bajarê Qutsê jî Xwendegahekê bi weqfan pir dewlemend dike xizmeta xelkê wî bajarî. Li Misrê xwendegayek bo Malikîyan jî dixê xizmetê. Ji bo aborîya van medresan û xan û mal û nexweşxanan weqfên ku gelek dewlemendin dixê xizmetê. Wan tesîsan bi hatinên (warîdatên) weqfan dide parastin û xwedîkirin.

Dîrokzanê bi nav û deng Îbn. Xelikan waha dibêje : “- Ez di dilê xwe da li ser karên vî camêrî sekinîm û min jî xwe ra got: ‘ Bê guman ew li dinya û axretê hemî şad e. Lewra wî li cîhanê ev karên bi nav û deng û evqas vegirtinên mezin û hêja û yên din kirin û bi vê re ewqas weqfên giranbaha jî saz kirin, lê berbiçav tiştek ji wan jî ne li ser navê wî ne. Xwendegaha Qerefatê bi navê ‘Medreseya Şafi'î’ tê ziman. Navê yekê dinê jî ‘Meşhed’ e. Ji Xanegehêkêra jî dibêjin ‘Xanegeha Seîd el-Su’eda’. Ji xwendegeha Henîftî ra ‘Siyûfî’ dibêjin. Ji xwendegeha Misrê ra ‘Zeynel-Ticcar’ dibêjin. Xwendegayekê din

ya Misrê ra dibêjin ‘Xwendegeha Malikîyan’. Li Şamê jî Xwendegehêk li ser navê ‘Malikîyan’ ava kirîye. Medresa Şamê ya ‘Salihî’ ye tenê li ser navê wî ye lê ew jî bê weqf e. Di gel vî welatê berfireh û wê desthilatdarîya xurt ew pir nefsbîçûk, xêrxwaz, nêzî xelkê, diltenik, dilovan, xwedî mîsyon û vîzyon bû. Ji xwendevanan pir hez dikir. Guh dida wan û piştgirîya ilimdaran dikir a.” (Mêzeke: Îbn. Xelikan-Selaheddîn Eyyûbî – Wergera ji erebî Emin Narozî –Avesta 2009 İstanbul)

## Qralîyeta Kurdistanê 1919-1924

Sala 1919 yê çewa ku Dewleta Brîtanîya ji rexê başûrva piyê xwe danî ser axa Kurdistanê, Şêx Mehmûdê Berzençî ewil kir Walîyê Silêmanîyê, paşî wî weka Qralê Kurdistanê pejirandin. Şêx Mehmûd dûdilî kir. Mistefa Kemal li ser destê Ozdemir Paşa ku wê demê li Rewandîzê Osmanîyan temsil dikira, bi Quraneke pîroz û mohra nibûwetê (Muhra Hz. Muhemmed) şeqilkirî nameyek ji Şêx ra rêkir. Şêx bi erênî bersuya nameya Kemal Paşa da. Wan jî (Jontirkan) bersuya Şêx Mehmûd deşifre kirin, ji Îngilîzan ra gotin ‘eva Qralê we eve’. Bê itîmadî kete navbera Îngilîzan û Şêx Mehmûd. Sebebê dilsariya kurd û Îngilîzan ne tenê ev tertîba Jontirkan bû. Her waha, Îngilîz

ne diristbûn, wan ji berê va bi Mistefa Kemal ra têkilî danîbûn û di binda li ser bextreşîya Kurdan li hev hatibûn. Kurd wê wextê bi çavê Dewleta Osmanîyan li hereketa jontirkan mêze dikiran. Ne bawerîya wan bi tirkan hebû, ne ji bawerîya xwe bi Îngilîz û Fransîzan tanîyan. Ji ber ku hê ji wextê hereketê Bedirxan Begê Botanva helwesta wan xaçperest û neft perestan eşkera bibû. Sala 1922 yê piştî Peymana Sewrê Şêx Mehmûdê Berzencî Qralîyeta xwe eşkera kir û hikûmeta Kurdistanê li bajarê Silêmanîyê ava kir.

Qebîna wî (Wezîrên wî) bi 8 kesan hatibû tenzîm kirin. Birayê Şêx Mehmûd Şêx Qadir Hafîz bibu Serokwezîr, Fileyêkê kurd Ebdilkerîm Alaka Wezîrê Daraî, Şêx Mihemed Xerîb Wezîrê Navxwe, Kerkûkîzade Hacî Mela Seîd Wezîrê Şer-î (dad), Zekî Sahîbqîran Wezîrê Berevanîyê bû. Mistefa Paşa Yamolkî Wezareta Perwerde yê girtibû ser milê xwe. Ahmed Begê Fetrah Beg bibû Wezîrê Gimrikê û Wezîrê Kar û Şol û Xebatê Hema Ebdillâh Axa bû. Ev hikûmeta pîroz ku nefelîşîya, wê Kürdîstana Başûr hê ji salên 1920'an va hikim li vê herêmê bikiran. Îhtîmala mezin Musil, Kerkûk, Silêmanî, Erbil, herêma Behdînan ya Amedîyê ku Zaxo û di hok jî di navda ye û heya Xanîqînê wê bibuya dewleteke weka Dewleta Urdin serbixwe. Li Lozanê bi teşwîka

Mistefa Kemal, tertîba Cimhûrîyeta tirk, xebata Îsmet Paşa, dewleta Îraqê kirin weke dewleteka ereban û ew erda kurdan ku di nava çerçewa Mîsaqa Millî da cih girtibû feda kirin, ji destê xwe revandin û çira kurdan jî belasebeb tefandin. Vê xirabîyê bi xwe ra jî kirin. Hêna jî li ser wî aqilê berê ne, hêna jî her tiştên xwe feda dikin ku kurd nebîne xwedan xeber û xwedan maf û azadî.

**Kurdîstana SOR (1923-1929)** Li gora prensîbê Yekîtiya Sovtêtê li gora ku her millet qedera xwe bi destê xwe girê bide, kurdên herêma Qerebaxê - ku dikeve nava coğrafîya Azerbeycanê - statuya xwe bi navê 'Kurdîstana Sor ya otonom' ava kirin. Piştî hingê Ermenîyên çavnebar û dilteng û keysfille, bi teşwîqa Mistefa Kemal Azerî û bi hevalbendên xwe yê nexêrxwaz va, Stalînê dîktator iqna kirin ku ewê statuya kurdan ji halê rakîn û kurdan li welatê Sovyetîstan belav bikin. Tenê sirgûna kurdên Qerebaxê beranberê sirgûna Telat Paşayê Osmanîyan e ku Ermenîyan ji Anadolê sirgûn kir. Ev axa ku kurd ji serî hatine sirgûn kirin û ew sosyalîstên mafperwerên nûjen(!), ku kurdan li vagonên heywanan siwarkîrîn şandine binê dine, ev ax û ew welat ji beriya Medan va erda Kurdan bû. kurdan di dîrokê da gelek

caran dewlet û mîrekîyan li ser vê axa xwe ya bab û kalan ava kirin e. Dewleta Şedadiyan 250 sal li ser vê axê ava bibû. Selaheddînê Eyyûbî ji vêderê ye. Ermenîyan van salan vî erdî ji Azerîyan sitandine. Her weka ku erd û axa bab û kalên wan e. Kes qala kurdan nak e. Dibêjin Xwurtî ji gayê cot ra jî namîne. Kurdistana Sor dikeve navbera Qerebax û Ermenîstana ku Xaldiyan beriya 2400 salan xêra babê xwe Deştê Revanê dane Ermenîyan. Dibêjin: “Dara ku tû radikî, dikevê nava çavên te.” Bajârên ku kurdan Kurdistana sor lê ava kiribûn evin: Laçîn, Kelbecar, Kubatli, Zengilan û Cebraîl.

**Komara Mahabadê:** Di sala 1944ê da bi navê “Komela Jiyana Kurd” rêxistinek li Mahabadê hate avakirin. Sala 1945ê di binê Serokayetiya Qazî Mihemed da “Partiya Demokrata Kurdistanê” damezirî. Qazî Mihemed, him bi şexsiyeta xwe ya bilind û malbatî, him bi dîndarî û ilimdariya xwe, pêşkêşêkê bi qîmê û kêrhatî bû. Îran wê demê di binê îşgala Îngilîz û yekîtiya Sovyetistanê da bû. Sovyetan izna kurd û Azerîyan dan ku parlamentoyên xwe berhev bikin û ‘şûra’ (Sovyet) ên xwe avakin. Qazî Mihemed Parlamentoya Cîmhuriyeta Mahabadê saz kir û roja 22.01.1946ê li Meydana Çarçira Komara Mahabadê eşkera kir. Piştî ku

dawî li Şerê 2. yê cîhanê hat Îngilîzan zor dane Sovyetan ku Îranê terk bikin û midaxela hindirê vê dewletê nekin. Sovyet ji Îranê kişîyan, Mahabad û Pêşmergeyên Mela Mistefa Barzanî nekarîn xwe li ber tang û top û teyareyên Îranê bigirin. Ne tenê Îran, her wiha Tirkîye, Îraq û Îngilîzan jî xwe ji kurdan ra gij kirin. Lewra dewleteka kurd xisarê dida berjewendiyên wan dagirker û talanbîran. Qazî Mihemed jî nexwest şer bê kirin û telefâtên giran bêne serê kurdan. Generalê Mahabadê Mela Mistefa Barzanî biştgirîyeke xwurt dabû xebata Qazî Mihemed. Ew îdî ketibû xizmeta vê cîmhuriyetê û Erkanê Herbê (Genel Kurmay Başkanî) yê vê dewletê bû. Serê pêşî Dewleta Îranê xwe nerm kir. Agirbestek bi kar anîn, ji pişka va li kurdan zivirîn bêbextiya xwe ya weka ji bab û kalan mayî li dar xistin. General Mela Mistefa bi Pêşmergeyên xwe va derbazî Urisatê bû. Gelek bi Serok Komar Qazî Mihemed va man ku wî jî nehêlin di nava lepê dijmin da, lê Şehîdê Mezin û Gewre Qazî, Ala Kurdistanê teslîmî Mela Mistefa kir û ji Barzanî ra got: “- Ez bawerim ku wê tû rojek vê bayreqê li hemî erd û warên Kurdistanê bilind bikî û milletê kurd bighêjîni azadî û rizgarî yê. Qadî Mihemed, Sadrî Qadî û Seyfî Qadî xwe kirin qurban ku komkujîyeke dijwar bi serê kurdan va neyê. Tiştê ku ji Maha-

badê ji me ra mayî 1- Berevanîya Siyasî ya Qazî Mihemed e ku ev parêzname dersdar û cesaretmedar e. Her kurdek divê ku berevanî û wesiyeta Qadî Mihemed bixwîne. 2- Wefadariya Qazî di derheqê Mela Mistefa'da û dîtînen wî Şehîdê mezin di derheqê lîderî û meznayîya wî şervanê mezin yê sedsala 20ê da pir giringin. 3- Bêbextî û qellaşîya Sovyetan û bi taybet neyartiya Stalîn ya bo kurdan. Ev cara 2. bû ku Stalîn bu sebebê felîşandina dewletên kurdan. 4- Kurdan carek jî piştî şerê cîhanê yê yekemîn dîtîna ku Dewlet û siyaseta Îngilîzan, naxwezîna kurd li ser axa xwe bibin dewlet û bighêjine mafên xweyên insanî. 5 – Bê wefayîya tirkên ku çewa kurd ji wan ra sadîqîn, sedcar ewqas ew xayîntîyê li kurdan dikin û ji vê xayîntîyê qe ruyê wan naêşî.

“-Ritbe, meqam û azadiya me, deyndarê Pêşmergan û Şehîdên Kurdistanê ne. Em bi saya Xwedê û Xwîna şehîdan gihane vê qonaxê ku ronayî daye xaka kurd û serê me pê bilind e.” Serokê Dewleta Kurd Mesûd Barzanî.

“- Kurê min Mesûd! Ezê li vir, li xerîbîyê bimirim. Lê Kurdistan û doza wê ya rewadar natefê û namirê! Divê rêbaza azadiyê ranewestê, divê hesreta di dilê Ebdisselam mayî, di dilê we da jî nemîne” — Mistefa Marzanî

## Dewleta Federala Herêma Kurdistana Başûr:

Serê sedsala 20ê, li ser destê Şehîdê Navdar Şêx Ebdisselam Barzanî rêbaza azadiyê, bo ku di çerçewa Dewleta Osmanî da kurd bighêjin mafên xwe û li herêma Behdînan mixtar bin, otonom bijîn, micadele dest pê kir. Şêx Ebdisselam 8 eşîrên herêma Barzan (Barzan + Mêrgesor û Şêrwan) kir federasyon. Ev federasyon rêxistineke millî bû. Şêx Ebdisselam, Erd û axa malbat û dîwan û tekyayê li gundiyan belav kir. Her gundek mizgevtêk tê da ava kir. Ev mizgevt ne tenê warê nimêjê, lê warê civîna gundiyan û cîyê mînaqêşan û tedbîr û çareserîyên gundîtî û herêmî bûn. Şêx Ebdisselam bo ku xort û qîzên kurdan ne bi peran, bi dilên xwe bizewicin qalanê rakir û ji bona zewaca gencan hêsani li dar xist. Gundiyan çekdar kir. Her gundek berpirsyarêkê jêra da kifşkirin, her eşîrekê jî reîsekê jê ra kifş kir. Rêxistineke siyasî, civakî û leşkerî raxist û sîyaneta olî û tarîqetî weke sîwanê bilind kir, bi vî rengî manewiyata gel xwurt kir. Navê van 8 eşîran bu Barzan, hemî îrada xwe sipartine wî xweşmêrî, wî siltanî.

Şêx Ebdisselam piştî ku herêma xwe da hev û tenzîm kir, li Herêma Behdînan zivirî, sala 1907ê li gundê Birîvkan pêşkêşên herêmî bi File, Misilman

û Êzîdî civînek li dar xist û raya vê herêmê hemî kir yek. Bune yekbend, yek dil, yek têl û yek hêz. Di vê civînê da biryar hate dan ku mûxtîreyek bidine dewleta Osmanî û daxazên xwe yên insanî û herêmî bo seraya bilind eyan û beyan kin. Piştî sala 1514 yê ku ji 20'î zêdetir Mîrên kurdan daxazên xwe bi nivîskî li ser destê Mewlana Îdrîsê Bedlîsî şandine cem Siltan Selîm, ev cara yekemîn bû ku mezinêkê kurdan li ser navê herêmek, bi nivîskî, xal bi xal û bi bîr û biryar ji Osmaniyan mafên xwe yên azadîyê teleb dikiran. Ev yek, tişteke balkêş bû.

Ev daxazname kurdan, li Osmaniyan giran hat. Wan artêşên xwe yên dîn û har rêkirin ser Ebdisselam. Şêx Ebdisselam xwe neda dest. Osmanî malbata Barzaniyan bi jin û mêr weka êsîran girtin û avêtine Hepsa Musilê. Di nava girtîyan da biçûkek bi navê Mela Mistefa -4 salî - hebû. Ew Mela Mistefa, li ber singê dayîka xwe bû. Wê piştî 7 salan, - sala 1914yê - Şêx Ebdisselam li Bajarê Musilê ji terefê Silêman Nazîfê Walîyê Musile va bihata dar da kirin û ew şêrê ku 4 salî bi dayîka xwe va ketibû hepsê, ew Mela Mistefa, di 12 salîya xwe da wê cendekê birayê xwe yê ezîz bi sêdarê va daleqandî, li ber tava germ û dijwar, bi çavên xwe bidîya û wê sond bixwa ra ku ew heya sax bî, xwe teslîmî van dewletên zalim

neke û rêbaza azadîyê yek sanîyeyek tenê neşemirînê.

Ew sozê wê rojê bû ku, îro em dibînin ew doza pîroz heya qonaxek bi cih buye. Îro ( 2010) eva 20 salin ku li herêma Behdînan, Soran û Babaniyan dewleteke federala kurd bi defaktoyî û bi makezagonî heye, ava ye, şên e, aram e û serfiraz e. Eva 7 salin ku Celal Telebani li Bexdayê Serokkomarê dewleta Îraqê ye. Hêşyar Zêbarî Wezîrê Xaricî yê nawenda dewleta kurd û ereba ye û Reîs Erkanê Artêşa Îraqê General Babekir Zêbarî ye. Kurd li ser axa xwe dewletin, ew axa wana ku niha hêja jî di mineqêşeyê da ye, di makezagona (Anayasa) Dewleta Federe ya Îraqê da bi xala 140ê hatiye pejirandin ku wê referendomek li ser vê mijarê bête çêkirin û wê kurd yek bostek axa Kurdistanê di dervayê federasyona xwe ya coğrafî û dîrokî da ji ereban ra nehêlin.

Weka ku em qala vê rojê bikin (2010), Silêmanî, Hewlêr û Dihok bi navçe û dorberên xwe va di nava çerçewaya Dewleta Federala Herêma Kurdistanê Îraqê da nin. Wali, Qeyneqam, Şaredar bi meclîsên xwe va têne bijartin. Parlemanto eva 20 salin ku bi helbijartineke şeffaf û gelek insanî intîxab dibin. Serokên Parlemanê, Serokwezîr û bi heyeta xwe ya wezîran va, ji terefê parlamentoyê va têne kifşkirin. Serokê Dewletê Rêzdar Mesût Barzanî ye . Te-

mamê umrê wî bi pêşmergeyîtî derbaz buye û çewa ku babê wî Mela Mistefa di 4 salîya xwe da li ser mesela pîrsa kurd û Kurdistanê di zindana Musilê da li ber singê dayîka xwe ya şêrejîn bû, Mesûd Barzanî jî sala 1946ê, li Bajare Mahabadê, di binê Ala Cimhûriyeta Mahabadê da hatîye dinê û ccenabê wî, ji wê rojê heya vê sanîyeyê di nava rêbaza azadîxwaza Barzanîyê Mezin da jîya ye. Mesûd Barzanî Serokê Hemî kurda ye û ew Serokeke millî ye.

Piştî sala 2003 yê ku Emerikan midaxele kir û Dewleta Federala Kurdistanê ava bu, di vî 7 salî da bi tenê ew pêşvaçûyîna ku li vê herêma azad da çêbû ye, 700 salên ku bindest bûn ev pêşvaçûyîna pêk nehat. Welatên bindestan ne bi pêş dikevin, ne jî bindest şad û xweşhal dibin.

3 zimanê fermî li Kurdistana Başûr serbestin zagonî ne û makezagonî ne. Kurdî, erebî û Îngilîzîne ev ziman. Kurdî zimanê sereke ye. Li hemî gund û bajar û kolanan, kurdî tê xeberdan. Dewlet bi kurdî xeber dide, di dibîstanan da bi kurdî tê xwendin. Kurd,

hîç bi erebî naştexilin. Asurî, tirkman û eqeliyatên din bi kurdî yê va, bi zimanên xwe jî dixwînin. Partiyên xwe û hemî komelgayên xwe li ser navên xwe vedikin û li ser navên xwe dibine wezîr heya mixtar û kizîr. Li hemî bajar û navçeyan Unîwersite (zango û şaxên zangoyan) hatine avakirin, Aqademîyên Leşkerîyê, Aqademîyên Polêsan û Aqademîyên Siyasetmedaran ava bûn e. Kurd di van warên granbaha yê perwerdî da bi zimanê xwe dixwînin û di warê ilm û irfanê da xwe dighêjînin qonaxên berz û bilind û berketî.

Ev dewleta federala kurd, dewleteke serbixwe nebe jî, di navbera serxwebûn û federasyonê da, gelek serbest û azad e. Em dikarin bêjin Konfederasyon e. Artêşa xwe, sînorê xwe, ziman û urf û adetên xwe û bi esayîş û berevanîya xwe va dewlet e. Dewleta kurdên Başûr e. Xwezî... Her perçeyêke welat, xwe bighandane vê merheleyê, bighîştane vî qonaxî. Jê pêva jî Xweda kerim bû. Wê rojek kurd ji binê nîrê esaretê rizgar bibin û wê bighêjine dewleta xwe ya azad û serfiraz.

## “Rojek dê were, kurbûn û axivtina kurdî dê bibe mode.,”



Metin Kara û Bîlala Înekcî

### *Bîlal Înekcî kî ye?*

Bîlal Înekcî sala 1958an li Încovê hate dinê. Lîse li bajarê Konyayê sala 1976an xelas kir. Sala 1978an hate Danmarkê. Ji 1987an vir da endame SF ye.

Li bajarê Ishøjê rûdine û wekîlê(cihgir) şaredar e.

Niha ji partiya SFê endamê parlamentoyê ye

*Birêz Bîlal Inekcî, xelkê me bi piranî te nas dike, lê tu dikarî tengî xwe bi me bidîye naskirin?*

– Piştî em hatin Danmarkê şûnda min zanî ku em venagerin welêt, ji bo wê min dest bi hûbûna [fêrbûna] zimanê Danmarkî kir. Di generasyonê yekemîn da yê ku danmarkî dizanîn kê mî bûn û ew car car tûşî probleman dibûn. Min pir caran alîkarîya wan wek werger [tercumanî] dikir.

Piştî demek kurt min wek werger li

komuna Ishøjê dest bi kar kir. 12 salan jî ez wekî ”mamostayê du zimanî” li dibistana gel xebitîm.

Li sala 1982an min xwe li semînarîyûma mamostatîyê qeyid kir û piştî du sal û nîvan min dest jê berda. Lê dema ku min mamostatî dikir li bajêrkê Ishøjê nufûsa kurdan pir bû, min jî xwest ez dest bi perwerdeya makzimanî bikim. Ji bo vê jî min pir caran serî li dayreyên peywendîdar da û gelek caran problem di navbera



min û wan da çêbûn. Ez dikarim bêjim ku yên di serê min ra derbas bûnî dîrokek e. Piştî xebateke mezin me li bajêrkê Ishøjê dest bi perwerdeya makzimanê kurdî kir û du dewreyan berdewam kir. Lê hem ji ber eleqedarnebûna [xemsariya] dê û bavan û hem jî ji ber kêmasiya nerêxistinîbûna me, piştî demeka kurt xelas bû.

Ez ji sala 1987ê û vir da endamê SFê me. 1989ê ji bo meclisa bajêrkê Ishøjê ez bûm namzet û di rêza 2. da hatim hilbijartin.

Tabî demê ku ez hatim hilbijartin, min li bajêrkê Ishøjê Televîzyona Medya hilda nav kablo TV. Piştî ku min dest ji kar berda televîzyona me derxistin. Lê ez dîsa vegeyîyam karê xwe û min roja duyemîn ya karê xwe, televîzyona Medya dîsa di kablo TV da bi cih kir.

Min sala 1992ê dest bi Dibistana Bilind ya Sosyalê kir û 3 salan min ji aliyekê da xwend û ji aliyekê da jî îdareya [debara] malbata xwe tenê bi "bursa xwendekaran" kir. Li sala 1995ê ez wek "Şêwirmendê Sosyalê" mezûn bûm.

Min piştî xelaskirina xwendinê li bajêrên cuda kar kir û niha ez li komuna [şehridariya] Vallensbaekê kar dikim.

*Partiya SFê listeyên namzetên parlementerîyê diyar kirin, netîceyek çawa ji bo te çêbû?*

– Erê bi rastî çapemeniya Danmarkê jî bal kişand ser vê netîceyê [encamê]. Bi netîceyê ku ji bo pir kesan surprîz, lê ji bo min qet jî ne surprîz, min bi 397 deng-an, piştî serokê SFê yê berê, di rêza diduyan da cih girt û bi şiklê ji sedî nod ez dikevim meclisê.

*Lê ji vî alî da jî surprîzek di çêbû; 14 meh pêş hilbijartinê tu zûtir gihîştî armanca xwe...*

– Ev ji bo min jî bû surprîzek. Parlementera SFê ya ji herêma min ji bo mehekê derket îzînê û partiya min jî xwest ez cihê wê bigirim. Ez niha bo mehekê di meclisa Danmarkê da parlementer im û ez dixwazim vê demê ji xwe ra bikim tecrubeyek.

*Reaksiyonên çawa gihîştin te, xeberê xelkê Încovê jî heye?*

– Na, li welêt kesekî xeberê xwe nîne. Bi rastî min ji birayên xwe ra jî negot.

*Pirsgirêka kurd hem li Tirkîyê, hem jî li welatên din ku girêdayî wê pirsgirêkê hene, gelek têne munaqesekirin û çareserîyek aştiyane pir aktuel e, tu bi xwe wek parlementerekî kurd ji bo vê mijarê çi dibêjî?*

– Wek min di destpêkê da jî gotî, sebebê ku ez ji welêt derketim û min barî vir kir, eslê min kurd e. Ji bo wê ez mijarê herdem taqîb dikim. Bêşik em di prose- sek bi heyecan ra derbas dibin, ez bi heyecanekê taqîb dikim.

Lê sistemê 80 salî, mejiyê tirkan bi gotina "kurd nîne" şuştîye. Niha jî ji nişka va hem dibêjin kurd hene, hem jî dibêjin mafên wan jî hene. Va jî dibe sebebê travmayê. Ez bi xwe ji prosesê hêvîdar im, dixwazim hêvîdar bim, lê provokasyon herdem derdikevin û dê derkevin jî. Bi bawerîya min her tişt girêdayî reforma makqanûnê ye.

Bi rastî li paşerojê tirk ê teşekurî [spasî] kurdan bikin ji bo xebat û bedelê kurdan

dayî hem bo guhorandina sîstemê, hem jî bo pêşvebirina demokrasîyê. Divêt em jî her dem organîzetir bin û xwudanê sazî û lobîyan bin.

*„Sîstemê 80 salî, mejîyê tirkan bi gotina "kurd nîne" şuştîye. Niha jî ji nişka va hem dibêjin kurd hene, hem jî dibêjin mafên wan jî hene. Va jî dibe sebebê travmayê,,*

*Yêk jî mijara perwerdeya makzimanî heye. Swêd û Almanya di vê mijarê da pir pêş ve çûne, li Danmarkê çi dikare were kirin?*

Bi rastî îmkanên li Danmarkê ji pir welatên di yên Ewropayê zêdetir in. Yanî heke 12- 13 kes hatin peyda kirin, mumkun e em sinifekê ji bo perwerdeya makzimanî vekin. Problem li vê derê eleqeya dê û bavan e û kemaşîya rêxistinîbûna me ye. Lê ez bi bawerî me ku pêşveçûnên li Tirkîyeyê dê tesîra xwe li vir jî bikin û mumkun e ku insanên me qîmetê hûbûn [fêrbûn] û nivîsî-

na kurdî bibînin û zarokên xwe bişînin perwerdeya makzimanî. Rojek dê were, kurd bûn û axivtina kurdî dê bibe mode.

*Nufûsa kurdên Anatolîya Navîn li Ewropayê têra xwe zêde ye, eleqeya wan digel siyasetê çawa ye û di nava siyasetmedarên kurd da têkilî hene?*

– Kurd ji bo pozîsyona xwe, bi taybet hem li Ewropayê hem jî li Danmarkê xelkê herî politîzebûyî û aktîv e. Ev avantejê mezin e. Bi bawerîya min diyaloga li navbera siyasetmedarên kurd pêwîst e. Diyalogeke bi vî şiklî dê pêşîya çareserîya pirsgerêkan veke. Lê niha diyalog pir kême e.

*Pirsa me ya dawîyê, peyameke te ji bo xwendevanên me heye?*

– Bîrnebûn ji bo xelkê me yê li Anatolîyê weşaneke pir girîng e û numûneyeke pir baş e. Ma xelkê me zêdetir li kovara xwe xwudan derkeve, bê dengbûn herdem kêmasî ye.

**Hevpeyvîn: Metin Kara**  
metinkaradk@gmail.com

Siyasetmedar û endamê Însiyatîfa Kurdên Anatolîyê li Danîmarqê, Bilal Înekcî niha di Parlemantoya Danîmarkê de wek parlamenterê partiya SFê cih girtiye.

Di meha 11 a 2010an de, ji Charlotte Sahl-Madsenê re ku wezereta zanistîyê ye (*videnskabsminister*), pirsêka zimanên Rojhilata Navîn hanî ku tê de kurdî, tirkî, erebî jî hene. Wî di pirsê xwe de pêşniyar kir ku di universîteyên Danîmarkê de ev ziman bêne xwendin û bibin xwedî master.

Bilal Înekcî pirsê xwe wiha motive dîke:

Bi sedan sal in kurd li hember politikayên tirk, ereb û persan ku xwestine ziman û kultura kurdî ji holê rakin, heta roja îro xwe parastine.

Ji ber pîraniya hemwelatîyên ku bi eslê xwe ne danîmarkî ne û bi kurdî deng dikin pir girîng e ku wezîr li ser vê pirsê bisekine.

## Pêşbirka ceribandinê ya navnetewî: DAHATÛYÊ JI RABIRDÛYÊ XELAS BIKÛN RABIRDÛYÊ JI DAHATÛYÊ XELAS BIKÛN

### Nuh Ateş

*Li ser pirsên li jor, di sala 1998 an da pêşbirkeke navnetewî ya ceribandinê hatibû lidarxistin. Pêşbirk ji her kesî ra vekirî bû. Lê zimanê beşdarbûnê sînorkirî bû. Beşdarbûn tenê bi çend zimanan, wekî inglîzî, frensî, çînî, hîndî, rusî, Elmanî mumkun bû. Ez jî bi zimanê elmanî beşdarî vê pêşbirkê bûm. Lê berhema min ne-kete tu dereceyan û heta niha li tu deran nehate weşandin. Ew wê roja, gava ku min li mal refan kîteba durist dikir, bi ber çavên min ket. Bi vê minesebetê, fikra wergerandin û weşandinê kete sere min. Ez pir li ser nivisandina wê xebitî bûm û lewma dilê min pê razî nebû ku ew diarê here. Min xwazt ku wê wergerînim kurmancî ji bo weşandina di kovara Bîrnebûnê da. Mijar û navaroka wê hîn jî aktuel in. Tenê gerek e ku xwendevan ji bîr nekin ku ev nivîs di sedsala bîstan ya rabirdî da hatiye nivîsîn û dema xwendinê vê li ber çavan bigrin. Nivîs ji bo weşandina di çarçevaya kovarê da dirêj e. Beşa yekem di hejmara 47an da hate weşandin. Beşa duyem jî di vê hejmarê da tê weşandin.*

- II -

### **Barkirina hezarsalîyê 3an**

Yekparetîya dunyayê ji pirparetî û ne-  
wekhevîyê pêk tê. Ji mêla hesabkirin û  
resewurkirina demê da jî cihêti hene. Li  
hêla dema xiristîyanî dema çînî û îslamî  
jî heye û gerek e ku hurmet ji wan ra jî  
bê kirin.

Barkirina li ber dêrî ya berbi hezar-  
salîya li pêş me ji bo hen kultur û xel-  
kên ku xwedîyê demên din in, qet ne

mihum e. Lê dîsa jî rabirdû û dahatûy-  
eke me ya hevpar heye. Em gîşt li duny-  
ayakê dijîn û tê da qedera me, bi taybetî  
di bin şertên globalîzma didome da, pir  
ji nêzik da bihevra girêdayî ye.

Niha yên ku li gorê dema xiristîyanî  
dijîn hendik maye ku derbasî hezar-  
salîya 3an bibin. Devê şorê ye, ku bix-  
wazin yan nexwazin jî ew ê bar kin û  
di şeva 31.12. 1999an û 01.01.2000an  
da bikişin hezarsalîya 3an.

Bi minesebeta vê barkirinê şahî û

gotarên mezin yên ku em pê hema-heng bibin dê bên li darxistin. Barkirin herdem tê meneya xatirxwaztinê jî. Wekî li ba her xatirxwaztinê, li vir jî fersend derdikeve pêş ku meriv daxwazîyên rind rucu bike û ji hen xerawî û xerawkêşîyan xatirê xwe bixwaze. Ji bo vê, ji her kesî ra gavavêtineke bi xêr berbi dahatûya hezarsalîya 3an be!

### Sahî ev dahatû dê bi çi awayî be?

Derengtir rojekê ji şahîyan bi şûn da, kengî ku em dîsa hatin xwe û rojejîyanê da rêya xwe ya hûkirî, em ê bibînin ku ji xêyrî katjimêra salê, duduyek bi sê sifiran va, qet nebe nivîsandina wê hêsan e, tiştêkî bingehî neguhêrtiye.

Ku ji huro da lê binihêrî, tu nîşan tune ne ku di sal û dehsalên hezarsalîya pêş me da guhêrtinên binyadî rû bidin. Tendenzên pêşkevîtinê yên ku destpê kirine dê dom bikin. Dunya li ser rê ye, di nava pêvajoyê da ye ku bibe “gundekî global”. Ragihandîyên li ser rûyê dunyayê dê di saye îmkanên teknologîyê da pêşva herin. Her heremek û her cihêkî dunyayê yê destpênekirî dê bi “bazara globalî” va bê girêdan. “Gundedunya” dê bêguman pirsgirekî bibe. Di dunyayeke han da pir însanê bi serî xwe, wekî “koçberê modern” û bi tenêmayî hebin.

Huro formên tevgêr û sîstemên me yên sîyasî dê kêmkirî û zêde berdewam

bikin. Dewletên netewî dê dîsa hebin lê manîdarîya wan dê kêmkirî bibe. Tevgirêdanên wekî Yekîtiya Ewropa dê biquwet bibin. Tevgirêdanan han çiqas mezin bibin, rola herêm û bajaran jî ewqas mezintir bibe. Şerên herêmî, xizantî, birçitî û bêkartî dê dîsa bi hêla me Kevin.

Dahatû dê li gorê pîpîka giregir û dewlemendên dunyayê bireqise. Ne tenê li gorê vê, her yek ji me jî dê di her gav û lezîneke vê reqasê da, bi destlihevixistî, lanetî, rexne û alîgirîya xwe xwedîyê parekê be.

Ku meriv li ser bingehê keseyatîyê lê binihêre, pir rûyên dahatûyê hene, veqasî rûniştvanên dunyayê pir. Ew ji milyaran nihêrîn, hêvî, payînî, xewn û tirsên derheqa dahatûyê pêk tê. Ji ferqîya navbera nîşan da jî cîh û meneya dahatû û rabirdûyê dikanin ji hev cihê bin. Merivên salmezînan pir yan hendik dahatûya xwe ji paş xwe va cidihêlin. Bervajî vê, dahatûya xortên nûgihêştî hîn li pêş wan e. Ji bo salmezînan dahatû bûyê rabirdû û ji bo xortan rabirdû jî hîn di nav dahatûyê da ye. Çêkirina resimekî dahatûyê yê rasateqîn û yekpare ne mimkun e.

Di dahatûyê da pêşkevîtyên ku bikanin rîsk û talukeyan bi xwe ra binin jî dê hebin. Di beşa teknîka gênî ya ku wekî teknologîya dahatûyê tê binavkirin û di beşa kulturê ya ku mîrasa me-

rivatîyê ye. Ev her du beş, bi ya min ji bo lêgerîna li bersiva pirsê pêşbirkê lêhatî xuya dibin.

### **Guhdanîya gir ya ser Gêne**

Teknîka gêne di pêşkevîneke bilez da ye. Ew di pir beşan da, di çêkirina tiştên xwedîkirinê û biberkirina nebatan da tê bikaranîn. Sewa ku cîsnên pirber peyda bikin li ser heywanan tê ceribandin. Bi teknîka gêne mîkroorganîzmên guhêrtî hene. Sewa alkariya meyandin û gihêştinê enzîm dikin nê, tiştên ku tî pêjandin û penê. Tomatesa antî-pûç ya bi patenta Amerîkayê di ketçapê Îngilîstanê da tê firotin.

Li bazara dermanan, di zêdeyî 300 dermanan da madeyên ku bi rêya teknîka gêne çêkirî hene. Insulîne ji bo nexwaşîya şêkir serî dikşîne. Li gorê hayadarîyên WHO (Organîzasyona Sîhetxwaşî ya Dunyayê) di sala 2000î da 160 mîlyon kes dê bi nexwaşîya şêkir bikevin. Ji aliyê firotinê da, somatropîn, hormonê mezinkirinê di ser dermanên din yê ku bi teknîka gêne çêkirî ra ye.

Hewldanên ji bo dermankirina nexwaşîyan bi rêya terapîya gêne hîn di destpêkê da ne. Huro mimkun e ku bi rêya testa gêne xwaşhalîya merivekî bê respîtkirin. Eksperîmentê li çaralîyên dunyayê ji bo dermankirina nexwaşîyan bi rêya terapîya gêne hetanî

niha tu serkevî neanîn meydanê. Lê dîsa jî eksperîment, lêkolîn dom dikin û pere tî ramedandin.

Hewl didin ku mîrata îrsî ya meriva yekser ji hev derxin. Sewa vê, di salên 80î da projeyeke bi navê "Human Genom Projekt" hate birêxistin. Armanca ew e ku bi tevlebûna navnetewî û bi projeyên li çaralîyê dunyayê hetanî sala 2005an gênan giştan ji hev derxin.

Di beşê hêkîmîyê da eleqeyêke mezin ji aliyê îndustrîya dermankirinê û hêkîmîyê ya mêl berbi teknîka gêne di derheqa respîtkirina hayadarîyên gêne yê merivatîyê sewa teşhîs û dermankirinê heye.

Hêkîmî dixwaze zûtir bigihê bînetara nexwaşîyan. Meriv huro pir nexwaşîyên ku bi destê gênen xerabtaybet peyda dibin dinase. Lê dîsa jî para wan di nav hejmara nexwaşîyan da kême.

Li Elmanyayê ji bo lêkolîna mîrata îrsî ya merivatîyê hetanî sala 1999an gişt li ser hev 200 mîlyon Mark hatiye amadekirin. Û ji bo lêkolîn û pêşvabirina teknîka bîyologîyê serî salê 2,3 mîlyon Mark tê xerckirin.

Li gorê lêkolîneke SAGB (Senior Advisory Biotechnology) ya Brûselê voluma teknîka gêne li bazara dunyayê di sala 1991an da 10 mîlyar Mark bû û hetanî sala 2000an dê bigihê 170 mîlyar Mark.

Di derheqa encamên demdirêj û rîsikên teknîk û lekolînên gêni zanîna me pir kême e. Ji bo vê tu hewldan tunin. Parêzmayeyên yasayî yên heyî li dunyayê ne wekhev in û têrê nakin.

Li ba vê teknologiyê armanc çi ye?

Ma wekî ku alîgirên teknîka gêni hetanî salên 60î û 70î îdia dikirin, daxwaz ew e ku ji problemên merivatîyê ra çare bê dîtin, nimune xwedîkirineke baştir û zayîneke bê xerabî û dermankirina nexwaşiyên bi rêya genetîyê?

Na, armanc ne van daxwazên di cih da ne. Dibe ku hen ji wan wekî efekta kênarî bî cih. Hîngê jî her kes jê feyde nabîne, çunkî ber û xizmetên teknîka gêni bê bedel nabin. Eger meriv nimuneyekê helde, her sal bi milyonan meriv li seranserî dunyayê bi nexwaşîya tuberkulozê dimirin. Nexwaşiyekê infektî ye û dermankirina wê bi îmkânên hêkîmî yên heyî mimkun e. Lê van îmkanan bi destê her kesî nakevin. Armanc ji vê teknologiyê bidestxistina hukumranî û serkêşîya li ser teknologî û bazarên dahatûyê ye. Bervajî berê, alîgirên wê huro armancên wê aşkere dibên.

Weşangerê kîteba “Gentechnik”, profesor Dr. Hans Günter Gasso di destpêka salên 90î da weha dinivîse: “Eger wekî dewleteke mêl berbi îndustrîyê armancên me yên mîna kanîna pêşbirikî û piştbazîya çîna navend he-

bin, hîngê gerek e ku em giranîyê bidin ser wan teknologîyan yên ku xizmete van armancan bikin, ew jî teknîka gêni ye.”

Di daxuyanîyêke “Însiyatîfa Bo Teknîka Gêni” ya îndustrîya kemiyê ya Elmanyayê (1992) wer tê gotin: “Bê teknîka gêni em ê parçeyek ji dahatûyê wenda bikin.” Wekî vê, wezîrê lêkolînê, Jürgen Rüttger roja 08.02.1995an gotiye, “nabe ku Elmanya şoreşa bîo-teknologiyê ya sedsala 21an di xew da derbas bike!”

Dibe ku van gotinên di derheqa kanîna pêşbirikî da di cih da bin. Lê gava meriv bi awireke bazirganîyê li teknologiyên ku hîmê sihetxwaşîya dunyayê eleqeder dikin mêz bike, gerek e ku ew û nîfşên paş wî ecêb nemînin gava ku dahatûyêke pûçbûyî bê pêşberî wan.

Ev pêşketîya dikane berbi ku bibe?

Meriv dikane dahatûyê wekî hêrişeke gir ya ser gêne merivatîyê bîne ber çavan. Zanyarî, bi piştmistdana îndustrîyê û alkariya politikayê hewl-dide ku rapêrîna dawîya pêk bîne. Rapêrîneke ku pê gêne, wekî parzemîneke mîkrokosmîk bitun bê zeptkirin û ji bo kêrwegirtina bazirganîyê bê pêşkêşkirin.

Di saye teknîka gêni da mimkun dibe: Tomatesa gêni ya Amerîkayê xwe dide tamkirin. Mîya kolonkirî “Dolly”

ya ji Edinburgê xwe bi raya gîştî ya cîhanê bi rêya televîzyonê da naskirin.

Yê din kerem ke! Rêza kê ye?

Pir nişan didin xuyakirin ku însan di rêzê da ye. Dahatû “laboratoreke bîonuklear” e û meriv jî tê da”hêsîr”e yan jî wekî “heywanê ceribandîne” hatiye bişûnkirin. Meriv dikane vê wekî tolheldana dunyaya heywan û nebatan jî binav bike. Nerindîyên ku însên bi jîndarên din kirî, niha tên serê wî. Bizara Schîller, “reşîk wezîfeya xwe kir, reşîk dikane here”.

Eger yasaya gênparezîyê rê bide, ma kîjan karsazê serdema teknîka gînî, dê kar bide merivên “camînî” û “xerabgînî” yên ku agahdarîya li ser van nişêdan di nasnemaya wan da cih girtiye?

Ma kî dê bikane pêşîyê li bikaranîna teknîka gînî ji bo armancên leşkerîyê bigre?

Eger meriv fantazîyê serbest berde, hingê resimên polîtîkvan û generalên klonkirî û şervanên bi manupuleya gînî hatine peydakirin yên di şekla “Batmans” da dê di ber çavên wî ra derbas bibin. Şervanên weha yên ku di dahatûyê da, di şerên li “çolên” rojhelata Navîn û “bozkîrên” Kafkasyayê û li her derên ku tê da heyîyên bi qîymet, wekî petrolê dertên, sewa ewlekarîya kişandina wan ya herêmên serfiraz, bînan bikaranîna.

Teknîka gînî îcadeke rojavayîya ye.

Ew gavavêtineke “Ewronavend” yan “Rojavanavendî” ye ji bo bidestxistina mîrata dunyayê ya gînî û firotina wê li bazarên dunyayê. Serdema “kolonyalîzma gînî” destpê kiriye. Va pirtir xwe di patentkirina gînan da nişan dide. Piranîya nebatên bikêrhatî yên dema me bi eslê xwe ji Başûrê ne, lê Bakûr xwedîyê ji sedî 70î materyalên gînî yên nebatên ku li dunyayê di bankayên gînan da ye. Bi rêya patentkirinê tê xwaztin ku kêrhatîya nebatan bê tespît û kontrolkirin.

Nîvê meha berçîle (berfbaran) ya 1995an Komîsyona Ewropayê îcaze daye ku gînen merivan ji bo terapîyê û yên nebat û hjewanan bînan patentkirin.

Mîrata gînî ya nebat, heywan û meriva wekî kevntirin rabirdûya me gîştan, wekî binyada heşmendî û bîyolojîya me ketiye dîsposîsyonê. Parêztina wê ji ber hêrişên bazirganîya dahatûyê wezîfeyêke pir mezin e.

### Qurbankirine kulturê

Umberto Eco di ceribandina xwe ya qalkirî da, bi minesebeta koçberîya berbi Ewropayê di hezarsalîya pêş da, balê dikşîne ser “rastehevhatîya” kulturê yan “şerên navbera kulturê jî hev cihê” bi encamên bixwîn. Eco ji koçberîyê “barkirina xelkekî ji ciûwarê xwe berbi şûnwarekî din” fehm dike. Ji wî xelkî çiqas li warê xwe yê berê mayî

ye ne mihum e, pirs ew e ku ew çiqas radîkal kultura welatê ku wî barkiriye diguhere ye. Li wir qala qefleyên penaberên ku berbi welatên Ewropayê yên dewlemend dikişin tê kirin.

Şerên “bixwîn” dê biqewimin yan na, kes nikane vê sedîsed bizane. Nimuneyên

Ji dema rabirdû ji bo her du êhtimalan hene.

Cihê gotinê ye, ”rastehevhatiya” kultura li Ewropayê, ji kî ku koçberî û penaberî berbi Ewropa didome, realîte ye, lê şikur hetanî niha ji xêyrî îstisnayan, bê encamên bixwîn. Lihevnehatîyên li ser vê bingehê ne ji ber cihêtiya kultura, pirtir ji ferqîyên wargehên sosyal peyda dibin. Li aliyekî penaber û koçber yên ku ji “cehenmeyên” welatên xwe filitî û li deriyên Ewropayê dixin hene. Li hemberî wan, xudmalîyên Ewropayê hene û hewldîdî ku pêşîyê li wan bigrin. Yanê liberhevthaneke li ser ciûwaran heye.

Lihevnehatîyên di navbera komên ku ji zû da koçkirî û xudmalîyan da, di navbera piranî û hendikanîyan da jî wekî vê ye. Di paşperdeya van lihevnehatîyan da pir cara piçûkdîti û kêmpariya hendikanîyan bi destê piranîyan heye.

Li wira taybetî û cihêtiyên kulturî zêdetir mîna faktorekî rewatî, îdentîtî û mobîlizetîyê ji bo bidestxistin û ser-

girtina armancên hukumdariya polîtîk tî bikaranîn. Bi vê şeklê, taybetî, naverokek û sembolên kulturî dikanin dînamîkên xwexas peyda bikin, eger ew bîndkirin û piçûkdîtin. Bi vî halî ew dikanin ji xelkê va wekî îrasyonel yan xwearmanc xuya bikin.

Nîşandana taybetî û cihêtiyên kulturî ji bo lihevnehatîyên sosyal her çû zêde dibe. Ji bo vê nimuneya naskirî, dîtinên zanyarê polîtîkayê yê Amerîkî, Samuel P. Huntington in. Dîtinên wî wekî kîteb bi zimanê almanî jî li ser navê, “Şerê Kultura” (“The Clash of Civilizations”) hatine belavkirin.

Huntington dixwaze dunyayê wekî ji heft yan heşt “dorkultura” peyda bûyî bibîne (rojhelatî, îslamî, çînî, yapanî, hîndî, latînamerîkî, afrîkî).

Ji tîzên wî yên navendî yek ew e: “Polîtîka dunyayê ya huro li gorê pîvanên kulturî û dorkultura tê hundandin. Li vê dunyayê, lihevnehatîyên hîşk, giring û metirsîtir di navbera çînan, dewlemend û xizanan yan komên din yên aborî da naqewimin, eksî, ew di navbera gelan yên ku dahîle yekîtiya kulturên ji hev cihê da ne diqewimin”.

Ev tîza pir li daxwaza dilê netewperest, rasîst û fundamentalîstên ji kulturên jihev cihê tê. Sewa îspata vê tîzê, Huntington çend nimuneyan pêşkêş dike: “Di lihevnehatîya Yugoslavyayê da, Rusîyayê alkarîya dîplomatîk da



Sirban û Arabîstana Sudî, Tirkîye, Îran û Lîbyayê jî pere û sîleh dana Boşnakan. Sebeba vê ne îdologî yan hukumranîya polîtîk yan jî berjewendîyên aborî bû, sebeb xizmatîya kulturî bû”.

Huntington berbi ya hêsan xwe ba dide û naxwaze ku aliyê din yê madelyayê bibîne. Eger motîva alkarîya di herba Yugoslavyayê da “xizmatîya kulturî” bibûya, hîngê gerek e ku meriv jixwe bipirse û bibê, ma çima ev “xizmatîya” li ba gelek lihevnehatîyên din pêk naye? Arabîstana Sudî di şerê kendavê da alîkarîya Amerîkayê û tîfaka rojavayîyan li hemberî “brawelatê” xwe, Îraqê kir. Tirkîye şerê kurdan dike, halbuku kurd bi tirkan va ji eynê dînî ne. Di lihevnehatîyên li welatê Baskan û Îrlanda Bakur da jî meriv raste eynê tiştî tê, li wir jî hemberîyên hev ji eynê “dorkulturê” ne.

Sîya rojavanavendîtîyê li ser tîzên Huntington heye. Ew dibê, hukumdarî berbi “kulturên” nerojavayî xuşîye û bange rojavaye dike, da ku ew xwe li hember vê “pêşmeşa” “kulturên” nerojavayî amade bikin.

Kultur avayê jîyanê ye û xwenimandîna formên her çeşid heşmendîti û hunermendîtîya merivekî, komikekê yan jî xelkekî ye. Ew pevajojeyê pir tebeqeyî û dinamîk e. Her kulturekî rûyê xwe yê kesatî, kometî, gerdunî û netewî heye. Her kultureke ku berbi derva yekpare

xuya dike, di nava xwe da ne yekpare ye, ew pircureyî, erê multîkulturî ye. Îndîvud jî dikanin pirkulturî bin. “Ez pîrjimare ye” wer gotîye Oktavîa Paz, nivîskarê Meksîkî yê ku demekê berî vê dunya xwe guhêribû.

Ez bixwe sê zimanî (kurdî, tirkî, elmanî) me. Bi van her sê zimanan dikanim deng bikim, binivîsim, bixwînim û fehm bikim. Ez vê wekî dewlemendîyekê dibînim. Di malbateke musluman da biziman û toreyên kurdî hatim şîretkirin. Hetanî 22 salîya xwe ez li derdorên tirkîaxif jî mezin bûm. Niha ji 28 salan vir da li Elmanyayê ya ku bûyê welatê (Eksîl) min yê duyem dijîm.

Sînoren kulturî huro pir vekirî ne. Wekî encama globalî û koçberîya gelan, li hemberî tendenzên eksî, li hen cihên dunyayê pevajojeyê tevlihev-bûyîna etnîyî, kulturî û zimanî didome. Tenê li Elmanyayê ji sala 1945an vir da, mîlyonek Elman bi kesên ne Elman ra zewicîne. Bîyanîyên ji nijadên cihê yên li Elmanyayê dijîn jî bi hevra dizewicin. Sala 1995 ji her şeş zewacan yek dunetewî bû. Ji zedetirî 7 mîlyon mihecîrên li Elmanyayê pîranî wekî nîfşên dudu û sisêyan li wir dijîn û bi pîrzimanî û multîkulturî mezin dibin. Li welatên Ewropayê din jî pêşkevîyên wer hene.

Geşbûnîyêke ku pêşana xwe heye.

Sala 1945an Carl Zuckmayer li ser vê bi avayekî pir balkêş nivîstîye: “Aniha carekê, ji xwedêdayîna Îse vir da, rêza ejdadên xwe bînin ber çavên xwe. Serpelekî Romayî, camerokî reşik, qehweyî, mîna zêtuna gihêştî bû û wî latînî bi ber keçeke porzer xist. Dûv ra biharetfiroşekî Yahudî hate nav malbatê, yekî cidî bû û di ber zewacê hate ser dînê xiristîyanî û hîmê toreya malbatî ya katolîkî dana. Û paşê hêkîmekî Yonan hat tevê bû yan lejyonerekî Kelt, nowedarekî Îswîçreyî, sîwarîyêkî Swedî, eskerekî Napolyon, Kosakekî revok... Van gîşt li kevîya çemê Rêne jîyan, meşîyan, meyvexwarin û stran û zarok çêkirin û - Goethe jî ji eynê sîtîlê derket û Beethoven û Gutenberg û Matthias Grünwald û - ax hîn kî tune ye, li ferhengê binihêre. Ew yê çêtirtir bûn, destbirako! Çêtirtirên dunyayê! Û çima? Ji ber ku li wir xelk tevlihev bûn”. Va tevlihevbûyîna xelkan û ketina kulturana ya navhev ji hîngê vir da zêdetir bûye. Sîtîla ku Goethe û yê din jê derketine pirreng bûye.

Li hemberî vê pêşveçûyîna û pîrrengîya kulturî ya bêhed û tevlihevbûna kulturana, bipêketina tevgerê ji bo dunyayê li ser bingeha ferqîyên kulturî yê heyî û yê qestî tiştêkî bê mene ye.

Konzepteke bi vê seklê qet ne li gorê rewşa kulturî ya dunya ye. Ev hêsan-kirineke asan e û Huntington bixwe jî

vê qebûl dike lê pêwîst dibîne. Ew ji vê, di dunyake tevlihev da, zêde dîyarî û efîzentî dipê û ji bo polîtîkvanan alkarîya rênîşandaniyê hevî dike. Lewma nexeseyeke dunyayê ya hêsan kirî. Ji bo heşkêman alfabeyake polîtîk bi heft herfên gir. Wer xuya dike ku ew ji polîtîkvanên dûrnebîn ra bibe pusule, da ku ew di sayê wê da bikanin berferê binihêrin, gavên gir biavên û qezencên pir bidestxî.

Eger meksed ne ew be jî, parvakirîna dunyayê li gor “dorkulturên” ji hev cihê dikane jihev dûrketinan zêde bike û bi vî awayî metirsîyên lihevexistin û şerên bi stîleke mezin dê her çû mimkuntir bibin.

Bi dunyayê ne lazim e ku ew li gor kîjan pîvan dibe bila bibe, her dem bê parçekirin. Ji dunyayê ra dadî û azadî bo her kesî, pîredlayî û li her derê aşî, pirdiyalog, xweşbînî û qiymetdayîn lazim e. Xweşkirina herêmên ruhê dunyayê yê birîndar di van rûmetîyan da ye.

Dorkultura dunyayê veqasî merivatîyê kevn e. Ew mîrata hevpar ya merivatîyê gîştî ye. Ma em rê bidin ku ew ji bo şer û lihevketîyên huro û li dahatûyê û daxwazên polîtîk yê hukmdariyê bê qurbankirin?

Hezîran 1998

## Goştê helal

Min carekê li Kopenhavnê dûkana kasabiyê vekiribû. Rojekê jinek hat, pirsî û got: "Îbo goştê te helal e?" Min jî bersiva wê da û got: "Erê, min îro danayek şerjêkir, hindika ma ku qoçê danayê zikê min qul bike." Jinikê goştê xwe kirî û çû.

Rojeke din ev jinika dîsa hat û got: "Îbo goştê te helal e?" Min got: "Erê, xuşkê goştê me helal e, min îro danayek şerjêkir, hindika ma ku qoçê danayê zikê min qul bike." Jinikê goşt kirî û çû.

Ev jinik mehekê şûnda dîsa hat, pirsî û got: "Îbo goştê te helal e?" Min bersiva wê da û got:

*Goştê me goştêkî helal e  
Ji derdan re derman e  
Ser da vexwe aveke zelal e  
Xwedanê xwe jî Îboyê delal e*

Û min dîsa got: "Xuşkê min îro dana teze şerjêkir, hindik ma ku bi qoçê xwe zikê min qul bike." Jinikê got: "Îbo, Îbo ziqûmê vê danayê hîn zikê te qul nekiriye?"

Îbrahîm Korkmaz

### AGAHDARYEKE GIRÎNG

Em dixwazin di her hejmareke xwe de, ji cil û bergên kurmancên Anatoliya Navîn wêneyekî kevn di Bîrnebûnê de biweşînin. Bi vî awayî em ê him bi tevgirêdana kurmancên Anatoliya Navîn bizanin, him jî em ê hay jê hebin ku kincên wan ên berê bi çi awayî ne.

Bi rîca û bi kêfxweşî em bi hemû kurdên Anatoliya Navîn didin zanîn ku: wêneyên kesên ji malbatê (jin-mêr), bi kinc û tevgirêdanên kurmanciyê li ba we hebin, ji kerema xwe ji me re kopiyekê bi rê bikin. Bi vê yekê em ê bi dewlenediya tevgirêdana xwe bizanin û em ê wan kesan careke din bi bîr bînin.

*Redaksiyon*

## Berxa Pîrê

Rojekê ji yayla Delala şivanek tere ber pêz. Dilê wî goşt dixwaze. Ji nişka ve aqilek tê bîra wî. Dibêje ez ê berxekê şerjê bikim û bixwim. Pîrê bêkes e, zarokên wê tunene, kesekî bi min re şer bike û niza bike tune. Şivan berxa Pîrê şerjê dike û goştê wê bi afiyet dixwe. Paşê difikire û dibêje ez ê çî derewan ji Pîrê re bikim. Roja paşîn tê gund, dibêje: Pîrê, Pîrê... çî hatiye serê min dizanî? Gur dada pêz, berxa te xwar. Min bi şiva xwe di pozê gur da lêxist, lêxist û min va pîlê berxê ji devê gur xilas kir û ji te ra hanî.

Pîrê dizanî ew derewan dike. Pîr dibê hiş be qurban, hiş be... min bihîst bila xelk nebîhîze!

Pîr li ser wî sitranekê dibêje.

*Pîrê dibê:*

Şivan jêlva têye, kera xwe bêbar e  
Berxa Pîrê maye bêzar e  
Xwedê xêra xwe bide  
Şivanî maye şevder e

*Şivan dibê:*

Pîrê min ra meke dozê  
Gurê devxwîn dada pêze  
Negot ev berxa pîra bêkes e  
Berxa te dixwar bênefese

*Pîrê dibê:*

Gurê me yî bêxêr û zekat e  
Guştê berxê dixwe bê kinat e  
Ji min ra hiştiye pîlê paşîn e  
Nîvê xwe yî reş e, nîvê xwe yî hişîn e

*Şivan dibê:*

Va gura yî pîrî har bû  
Heva şevê pîrê sar bû  
Min şiva xwe î lêxistiye li pozê gur e  
Ji te re xelas kiriye va parcê pîl e

*Pîrê dibê:*

Gurê me yî ji malê  
Goştê berxê li nalê  
Lo lo şivano li ber min melîze  
Te ji min re got, bila xelk nebîze.

Îbrahîm Korkmaz

## Deh û du salî bûm, bûm berdêl.

*Ji mêj ve û beta roja îro jî zewacên bi vê forma berdêlê di nava kurdan de heye. Bêguman li gor demên berê îro gelekî kêmîtir bûye. Li ser başî û nebaşîya evê forma zewaca berdêlî, hevkar û nivîskara me Altûn Başaranê ji devê Fatê xanimê, berdêlî guhdarî kiriye û em jî ji bo xwendevanên xwe diweşînin.*

Red

Peyîz bû. Salên min dehûdudu bûn. Ez li derve bi hevalên xwe ra dilistim. Diya min bang kir û got; Fatê were! Were em ê ji bo birangî te Kemal herin Bîradirêj, xwazginciyê. Ne birangê min keçik nasdikir ne jî keçikê birangê min.

Em ji xwazginciyê vegeerîn, lê kêfa malbatê min ji bo ku keçik nedan tunebû. Min pirsî çima, gotin dê û bavê keçikê xizan in û lawikî wan î mezin e. Ê dixwazine keçika xwe ji birê ra bikin berdêl.

Bavê min pir bi hêrs bû û got: Berdêl çiyê? Nehat virku em pîrsekê jê bibirsîn. Diya min got, deng meke, mukî ezraîlî bi wî ra ye. Em ji bavê xwe pir titirsîn. Ez dawestîm, min tu deng nekir. Doradina rê (rojê) serî sibê bavê min çû cem apê min Salo. Apê Salo wê wextê reîsê Omara bû. Wê wextê li Omera erd bela dikirin. Erd didane xortên zewicî. Bavê min jî ji bo ku birangê min Kemal erd bistîne bi apê min tanişî. Apê min got wê wextê em herin li kutukê mez kin ka keçikê sale xwe çi ne?

Mêz dikin. Salên min di kutukê de du salan mezin hatiye nivîsîn, ji bo ku xuşka min a ji min mestir miribû ez jî kirime şûna wê.

Dûra tîn qirara xwe didin û dîsa terin Bîradirêj, zozanê gundê Omara, tatliya(şêrîniya)me her du Fatan dixwin û vedixwin.

Sewa ku erdê bidin birangê min, ez kirim berdêl.

Xebera min ji tu tiştî tune, eza xizan 12 salî me, ne wenga zana me. Zar im. Wê demê li gundan televizyon mîna niha tunen. Zarên niha pir bi şans in û hertiştî dizanine. Di gûna me ra tu tiştî wusa tunebû. Dê û bavê me çi digotin, ew dibû. Me gotinek nedigot li hemberî dê û bavê xwe. Lêvên me ji ser hev ranedibûn. Erê, serê we nêşînim em çar salan bi dergistî man.

Me qe tu cara hevdu nedît û me hevdu nas nedikir. Dergistê min û birayê min çûn eskerê. Dergistê min di ber birangê min ji eskerê hat. Wê wextê dawet ji xermana bi şuwa diki-



Fatê xanim û dergistiyê xwe Hes

rin. Piştî havînê zaxîra xwe helnan, wan ji bo ku qelindê keçikan nedin, em kirin berdêl. Malbata dergîstî min zêr û bajara keçika xwe kirin, bavê min jî zêr û bajarê min kir. Hertîşt tamam e, em î li benda birangê min in ku ji eskerê were û em dawetê bikin.

Lê xwasiya min ji min hez nedikir. Navê dergistiyê min Hes bû. Rojekê ji Hesê re tewê; were! Min ji te ra filan keçik dîye, here birevîne. Hes tere ba hevalekî xwe ku motirsîkleta heye, ew ê bi motirsîkletê keçikê birevînin. Wê rojê mij û duman dikeve erdê, nikanin. Xaltîya dergîstê min, Mok, dibêze Hesê, dibêje ev çi eyb e, wûn fedî jî nakin ev berdêlên hurda jî zêr û bajara xwe bûne, izlema wan derxistine, em li benda Kemêl in. Ew ji eskeriyê were ku em daweta we bikin. Nawe! nawe! qe nabe! Here dev jî berde...

Wexta ku Kemal ji eskerê hat mizgîn dan me.

Berbîyên min hatin ber mala me,

berbîyên Kemêl jî çûn ber mala wan. Tenê diya min li mal bû. Hemû xuşk û birangên min çûn ber mala berdêla min. Min xwe kire paş qêpî, ji tîrsa bavê xwe min nawêrî tişteki bêjim. Berbîyên min govend girtin, xwarin û vexwarin. Ez ê ditirsime, digrîme.

Dora dine sibê fistanakî herî kesk li min kirin, kitanek avêtin serçavên min, ne wek niha ku zave bûkê ji malê bavê dikeve dêst derdixe, vêzave li navbera celê zemerî ez siwar kirim, birim mala Hesê. Berdêla min jî, birin mala me.

Ez hatim mala xenzûrê xwe. Kesî nas nakime, xwe xerîb dibînim. Ji bo ku bavê min em nedişandin cîranan, em tenê li mal bûn, nedihişt ki em derêne der.

Bû êvar Hes hat, cara siftê ye ku em hevdu dibînin. Em hîn zar bûn! Me zû ji hev hez kir. Hîn jî ji hev hez dikin.

Tenê, berdêlî ne baş e, rojekê tişteki wan dibû tesîra xwe li me dibû. Ji bo min û Hesê zewaca me baş çû, ji bo berdêla min û birangê min baş nedîçû û tesîra xwe li me dibû. Berdêlî ne tişteki baş e, min xwe wekî însan nedîdî. Çi bêjim, li ba me qîmet nedidane keçika, tenê lawik bi qîmet bûn, digotin tu egsigek e, başta tiştin, çima? Em jî însan in!..

# Lillith/Lîlî

## Pîrika Nûra Hesê Hemê

### Ûsikê Cimik

Xwedê heta dev tijî hêrs bû, ji hêrsan brûsk vedidan. Adem û melekên li derdorên wî ji zimên da ketin û çok li wan sist dibûn. Xwedê berî xwe çexê melekên kir û got: 'herin ji wê re bêjin, ma zû vegere vir'. Sê melek bi lez hatin û li hemberê Lîlîyê amade bûn. Li hêla Lîlîyê melekê herî mezin Şamel û li derdorê wan jî bi sedan zarok dilîstin. Hersê melek jî pate dan wan. Lê wan tu bersiv nedan wan, herdu jî bi hêrs û bêtirs bûn.

Hîng jina Adem a duwem Hewa tunebû, Xwedê, Lîlî û Adem ji xwulîyê çekirbû û bi hevdu re zewicandin. Her ro tiştek di navberî wan de dibû pîrsek. Pîrs jî wekhevîya jin û mêran bû. Pîrsa herî mezin li raketinan derdiket: Lîlîyê nedixwast her şev bikeve binê Adem û jê re digot: 'Tu jî û ez jî ji çengek xwulî hatin çêkirin, divê tu ferq di navbera me da tûnebe. Carekê jî tu bikeve bin min'. Adem jî ew qabûl nedikir, bi hêrs diket û ji bo vê jî her ro ji hev dûr diketin. Xwedê jî heq dida Adem, Lîlî jineke serbixwe bû, ne guh da Xwedê û ne jî Adem. Ji bo vê wê serhilda û ji Adem cîhê bû û bi melekê herî mezin Şamel re zewicî û ji wan bi sedan zarok çêbûn. Xwedê bi zewicandina Şamel re her ku çû bi hêrs ket.

Xwedê ji Adem re ji hinek parsîyên wî Hewa çekirbû. Lê çend zeman derbas bûn jî Adem Lîlî ji bîr nekir, her ro mîna xwînê

li ber Xwedê gerî. Ji bo vê Xwedê sê melek sandibû cem Lîlîyê.

Melekek gavek pêş da avêt û serê xwe hinek hilda û got: 'Xwedayê me got, 'vegere mala xwe'. Berdevkê melekên gotinên xwe bi dengê bilind berdevam kir û got 'eger tu venegerî cem Adem, emê her ro sed zarokên te bikujin!' got û vê re jî gava xwe paş da avêt.

Zarok yek bi yek hatin kuştin. Lîlîyê jî bo zarokên xwe ne şîn kir, ne jî hêstirek ji çavên xwe rijand. Hêrsa xwe bi rindbûna xwe ve tevlihev kir û paşê 'hû' kir wê û jê heyfek çêkir û wê ew li ser çiyayê Sînê li ser dunê rijand û vê re jî bang kir: 'Ez êdî bi sond im, heyfa min heta dawîyê berdevam e. Ezê zarokên ji piştê Adem û Hewayê de bikevim wan di çel rojan de bifetisînim.'

Lîlî bi qirîna xwe ve zirav û vê re jî dirêj dibû. Dûva li derdorên xwe valist û ew bû dezîyek, dezî bû bablîsokek paşê bablîsok bû çîkek. Xwedê bi hirsekê qjînyek li ser wê xist û vê re jî brûskê çeng wê kir, lê Lîlî ewqas pît û bezî bû ku êdî ne dengê Xwedê û ne jî brûska wî di wê digehîşt. Çik di yezdah qatên zemên re derbas bû.

Sala 1974an, li gundê Xelikê Jêr roja hîva çardeşevî bû. Li vê şevê ronahî, ne dengê û ne jî rêçek hebû, bi tenê li ser paca xanîyê Mala Nûra Hesê Hemê

bûmekî mîna vîda serî li xwe rast û çep badida. Ji hêla sêz de, ji ezman çîkek li ser Goma Malê Mil Omer ket û vê re jî du sê bablîsokên biçûk peyda bûn, paşê li ser tûman re û dûva jî li ser Pirê Malê Hesenê Qede re derbas bûn, yek bi yek ber ve gund dihatin. Her yek li ber teqên malan hêvirîn, jê bûkên bi xêlîyên renk bi renk xemilî derketin û bi dohl û zûrnan, bi lîliyan di nav kuçeyên malan de belav bûn.

Sîya yekê li ber teqê Mala Nûra Hesê Hemê xoyî kir. Perda sipî pêl da. Pisika malê bi çavên xwe yên biriqî li taqê mez dikir. Pêtîyên lambê çirê li ser yên raketî re dihat û diçû. Nika jî sî li odê li diwêr bû, ew li ser yên raketî re xuş dibû.

Nûra Hesê Hemê di nav cîvinên xwe de, di xeweke kûr da bû. Dergûşa xwe ya bîstrojî li kelekê wê radiket. Lawikê xwe î donzdehsalî jî di quncê odê de xwe topî ser hev kirbû, neradiket, ew xelmaş dibû. Nûrê ê her ro ji wî re a bigota, 'Heta çel rojan tu ê li bendî dergûşê bî, ramekeve haaa!'. Çel ro û çel şev ji wî re dibû zîndan.

Ewrekî reş di ber hîvê re xwe xûş dikir. Êdî şeverêş li ser ronahîyê giran giran xwe cîh digirt. Ji dûr ve ji hêla sêz da firîskîyan şivanan bi dengê kuçikan ve berhev didan. Destekî du sê caran 'hû'ê milê Nûrê kir. Nûrê çav vekir, ew çî bibîne! Nûra Hesê xwe rast kir û bi dengê şaşmayî ji wê re got, 'We!... Xûngê! Ez bi qurban! Tu bi vê çaxê hatî vir çî!'

Gula Hesê li ser Nûrê xwe xar kir, bi dengê nerm û hêdî hêdî ji wê re got, 'gotin dergûşa xunga te bûye, ez ji îşa nege-

hiştim werim cem te. Ez li dorê! min go, ji te re ûdeke binîm, loma ez bi vê çaxê ketim rê.'

Nûrê ji wê re got, 'Xûngê, xûngê! Çima tu weng rind bûyî, ez bi qurban! Teme tu bûyî dîlberek, maşalah! Maşalah! Tu yî dibiriqî' û vê re jî 'tûh' dikir serçavên wê. Dû ra Gula Hesê li hêla dergûşê rûnişt û bi lez dest avêt paşla xwe, topek derzî jê derxist û wê ev bi lez çengê ser dergûşê kir, qîjinî bi dergûşê ket. Bi qîjîna dergûşê re Nûrê di cî da xwe avêt ser dergûşê û hemiz kir. Nûrê xwast ku rabe ser xwe lê nig lê sist bûn, xwast ku bang bike lê deng jê dernediket. Gula Hesê li ser Nûrê rûnişt û dest avêt qirika wê. Nûra Hesê di bin wê de cirifî, her ku diçû xof li ser wê giran dibû. Çav li Nûrê bel bûn û mîna marekî lê vedilistin. Benz li wê zer bû, bû xizik. Zîman di dev de reş bû, bû qetran.

Êdî dest û pêyên Nûra Hesê lê sist bûn, serî li xwe dihejand. Ew di bin xwû da bû av û bi 'wexewexa' Nûrê lre awikê xwe venciqî û ew di cî da rabû ser xwe û hat li ser dayika xwe runişt û herdu destên xwe da ser milê wê. Gula Hesê devê xwe kir bin guhê Nûrê û bi dengê vedan ji wê re got, 'Eee Nûrê! Hîng bîst rojên te hene!', got û vê re jî Nûrê di porê lawik re girt û ew da ber xwe, bi 'wewera' lêwik Nûrê çav vekir û bi xwe heşîya û bi wê re jî dergûşa xwe hembiz kir.

Wê di ber xwe de jî got, 'orîspî ji orîspîyê îro jî xwe kirîye tola Gula me'

Hestirka sibê li jor Goma Malê Mil Omer xwe livand. Agirên şivanan ji dûr ve mîna çîkekê xoyî dikirin.



## Li kucê tarî

kevir ji erdê heyne  
kevirekî biçûk  
di nav lepî xwe da veşart  
demake bi şunda  
kevir bi xwînê ku di damaranda radigerî  
germ bû  
kelî  
û  
şewitî  
wî  
kevir kire nav pêçiyên xwe  
û kevkir  
kêvir perikên xwe vekirin  
û firî  
kaînat fireh  
mejo yê wî ronî  
dest û piyên xwe serbest  
ew wiqas rihet bû kî  
xwe da berroj

Seyfi Doğan

## Ne şewitîm ne jî vemirîm

Cîhana xewnên şîrîn  
di bîra kedereke nûdem de  
binax bû  
zimanê hezkirinê  
di hewza temenê şêlû de  
xeniqî  
stûna pişta derbirînên nîvco  
qeyrana ruhî ya bêderman  
derbas dike  
feleka bextreş konê xwe  
di xwîna rayên canê min de  
vegirt  
ez  
ne şewitîm  
ne jî vemirîm  
li brûskvedena şevên newêrek  
aloziya baraneke îlegal im  
li qonaxa hostatiya gotinên sernerm  
anarşîstekî camêr im  
ji devoka ker û lalan  
ji helbesta xwe ya xam re  
peyvên kemilî deyn dikim  
serçavên xiyaneta rojên gemarî  
bi şewqa çira awirên rindikê  
dişom li nav toza çol û beyaran

bêrikirinên berbabûyî  
berhev dikim  
ji parzûna demsalên serxweş  
kêf û aramiyê  
dipalînim  
ji pêsîrên paytexta serhişk  
bextewariya jiyaneke şîn  
dimijim  
li serma şevreşên xewle  
tava rojê di berîka xwe de  
digerînim  
min  
lîsteya êş û keserên xwe  
çarçove kirin  
û bi stûyê okyanûsên pîr ve  
daliqand

**Xizan Şilan**

2009-12-28

Stockholm

## ŞERVAN

Ez û helbest  
Stûxwar dimeşin li ber bircên Stenbolê  
Piştî barîneke payîzî  
Çendî henûn dixûya derya  
Çendî bişehwet pêl dide...  
Li hêla Sarayburniyê  
Li ser keştiyeke Osmanî  
Destê wan zincîrkirî  
Lingên wan qeydkirî  
Şêrên bigulî  
Ji bo cara dawîn serê xwe rakirin  
Bê  
Simbêlê wan badida.  
'Ew şervanên welatê bê derya..  
Welatê çiyê..  
Şervanên tekçûyî...'  
Xencerên wan hatibûn standin  
Şal û şapikê wan bê şeleme,  
Dilên wan şikestî  
Tên avêtin  
Ji mirinê re...  
Ji masiyan re  
Weke êm...

Çûn ava!  
ber bi kurahiya tariyê ve.

Çûn!  
tevî jin,  
zar û zêçên xwe  
Belawela..

Mij digire aso  
Stû xwar dibe serê min  
Mest dibe helbest bizelûlî  
Li wêraniya bircan  
Li hember pêlên behrê...

29.11.2008 Şivan Zeren

## Zarokên kurd

Ji me re dibêjin zarokên kurd  
Em têne dinê yek yek, cot cot  
Roj bi roj mezin dibin, dibine xort  
Natirsin em ne ji tanq, ne ji top

Dayika em dipêçandin bi axa sor  
Em aş dikirin bi sitranên lor û gor  
Dixemilandin bi rengên kesk zer û sor  
Digot zarokên min para welatê bi birîna kûr

Em jî wek zarokên dinê nehe mehî ne  
Lê çima em tim belengaz û sêwî ne  
Felek rojeke bi ken ji me re pir dibîne  
Para me jî tim girî û şîn e

Em li welatê xwe bûne biyanî  
Kesek bi ahlê zarokên kurd nizane  
Hemû zimanê dinê re serbestî  
Zimanê kurdî tim bextreşî

Dixwazin zimanê kurdî zarokên kurd  
Naxwazin zimanê ereb, ecem û tirk  
Dizanim dijmin zimanê kurdî kiriye  
Naha jî ber tirsê zarokên kurd pişt lê bûne firk

Îbrahîm Korkmaz

# Çola Xwê

Seyfi Doğan

Elî Çiftçi telefon kir û got; ez, Îrfan Baysal û Muzaffer Özgür, em ê dixwazinî te zîyaret bikinî. Ser seran ser çavan. Dema ku Elî telefon kir min jê re got; mala Nuhî Hecê yê li perî gund, li ser derîyê we ye, Nuhê li ser derîye xwe ji malê heynîn û werin mala me. Min bi Eli re deng kir bi şunda, min ji Mem Xelikan re telefon kir û ji bo ziyareta hevalan malumat dayê.

Devdeve berêvarê, heval hatin mala me û em gavakê rûniştin. Me çay û kahvê vexwar û li ser civîna Încovê deng kir. Cara siftê ye ku civînek, li ser tarix, ziman û koçberîya kurdên Anatolîya Navîn li heremê ku kurd lê dijîn ê tê dagirtin. Ew bi serî xwe pêşdaçûnêke heja ye. Gelek zencîr qetandin û bend tarûmar kirin. Berçavên insanan vekirin û çergên tirsê paramparçe kirin. Hevalên ku bejdara civînê bûyîn, gelek keyfxweş bûn. Heval ji hejmara bejdarên memnûn bûn. Em hemî bi serkeftina civînê xenê bûn.

Demakê li mala me rûniştinî bi şunda, min pêşniyar kir ku em herin Çola Xwê zîyaret bikin. Golê xwê bostekê ji me dur e lê piraniyan ji me hîng gol nedîtine.

Pêşniyazê min hevalan bêmineqeşê bi hev ra gotin baş e! Min ji Mem Xelikan re telefon kir û got; ma neyê gund. Em ê wî li ser rîyê Êngurîyê heynînî û em ê dixwazin herin çole xwê. Memê dil kir. Em derketin ser rê.

Meha teboxê û germe Axylonê. Rojê dikilijînê. Tirêjên rojê wek dilopên baranê dibarîn. Dunê wek odeke ku di zowê da agirî kix vêdike bû. Îsal zêde germ bû. Her derê zer dike. Hundirî erebê bibû hemam. Erebe li ser şosê xuş terê. Doralîyê me tarlên ku nu hatin çinîn, sapî di terla da weng cîh hiştine. Di sêpî di nav terla da merî tehmîn dike ku zevîyê îsal çê bûne. Dema ku em di kelekê kanîyê Hemî Bêzê re debas bûnî, me tu kerîyên pêz li ser kanîyê nedîn. Berê kerîyên Kuluyê û zozanê Malê Oskê ji bo avdanê li ser kanîyê diketin dorê.

Erebên ku ji bo rexistinê şosê, kûm ji Kozanliyê dikşandin wek kurşîne dajotin. Şosê xerab û dunê qelerî dikirin. Erebe taybetî gelek zêde bûn. Piraniyên ereban ji welatên wek Swêd û Danmark hatibûn. Dema ku min li dawîye hezar nehseşêştî, li Kuluyê ortaokul dixwend, bi seatan derîyê



Ali Çiftçi, Mem Xelikan, İrfan Baysal, Seyfi Doğan û Nuh Ateş li Çola Xwê.

wasitekê dipe ku ma min bi gund gihîne. Pir caran em telebên ji Xelika ku li Kuluyê dixwendin, bi pêya diçûn û dihatin gund.

Wexta ku em li perî Kuluyê, di ber ofise re derbas bûn, bi sedan kamyonên ji bo ku barê xwe yî ji ganim û cê bifroşin ketibûn rêzê. Ew jî kamyonên bargiran. Piraniyê kamyonan markê xwe M.A.N bûn. Kilama Kurt Remzî ya “Kamyona sur/kamyona Îzzet” hat bîra min.

Rîya Ankarê berê di keleka rojava Kuluyê re derbas dîbû. Îro ew rîya yê ketiye nav hundirê Kuluyê. Her du aliyên rîya Ankarê yê bi xaniyên nû hatina avakirin. Xanî ji nûbûnê bitir tu taybetiyên xwe tunen. Beton, be-

ton û ji beton in. Ser xaniyan bi ”güneş enerjisiyan” tijî kirine. Piraniyên xwediyên xaniyan ê li welatî Swêdê dijine.

Me, Mem Xelikan, li ser rîya Engurîyê heyne û bere xwe da Çole Xwê. Li meqesê me beriyê ereba xwe, berve Aksarayê kir.

Li meqesê rîya Ankara bi du aliyên dibe. Aliyêkî berva Ankara, aliyê din jî berve Adana dewam dike.

Erebe me li ser rîya aliyê rojhelatê golê da dixuşe. Ew rîya ê di gûna Sultan Ahmet II, ji bo ku dewleta Osmanîyan bi Baxdadê re tekîliyê danîne wek güzergah hatiyê ava kirin.

Elî Çiftçi yî erebê dajoye. Rîyê e-cer hatîye asfaltkirin û hîn jî asfalt-

kirine bi der û der berdeyam dikê. Erebe yê wek marekî, li ser asfaltê xwuş dibe. Doralîyê şosê, gundên tirkan û kurdan ê xwe bi cîh kirine. Piranîyên gundan, gundên kurmanca ne û yê li ser pîyê çepê dikevine. Wek Büyükkışla, Akarca, Büyük Damlacik, Küçük Damlacik û Yusuf Kuyusu.

Derdorên rê, terlên cê û genimên ku hatine çinîne ne. Rojê li ber êvarê yê terlên zer, her kî çu zer dikine. Dîmeneke xemgîn e.

Em ê xenê nî û yarîniyan dikinî. Hewake canecan, nerm, dilsoz û dilrastê di navbarê hevalan da heye. Em ê di navbarê da dişemitinî ser mijarên giring. Dema ku însan li ser mijarên hêsan deng, mineqeşê an jî sohbet dike, ew demanan, demê însanan herî bextîyar in. Mixabin, piranîyê însanan eger babetên sohbetan giran nebûn, wan sohbetan û gotûbêjan hêja nabînin. Halbûkî; mijarên giran derd in, şer e, ceng e, nexweşî ye û birîn in. Însanên Rojhelatê Navîn, ji xemgîniyê pir hez dikin.

Ez î ji hevalan re qala şivanî û şoferîya xwe dikime. Yekcar re îtirazê têne. Mem Xelikan, ji bo şoferîyê min qala gotinê Nuhî Hesê kir. Nuhê Hesê yê gotibe ku; ehlîyeta Seyfi tûne, Seyfi nikane ku erebeka hespa jî bajo. Ew ê ancax, tekereba hespa bajo. Em kenîn. Kefî li navê!... Min ji got

kî; min li Stockholmê tîrenê metro sê salan ajot û şahîdê min Elî ye. Elî yê bizane. Çimkî Elî jî tîrena metro li Stockholmê çend salan ajot.

Derdorên rîya Aksarayê bewrar in. Tirêjên rojê bewraran wek kozîyê argûnan sor dikine. Xerîbêyekê xwe da ser min. Li dawîyê bewraran de hewşoyên ku hetine terkkirinê xuya dikirin. Diwarên hariman xelî û serî tolikên şivanan vekirî bûn. Dîmeneke xemgîn!.. Ez zîz û kelgirî bûm. Kilam û ziravê bilûra Uskî Milê hate bîra min "Were komê..."

Herman Wenzel-Wolf-Dieter Hütteroth, G. Perrot û P. de Tchihatcheff û çend zanayên ewropîyên ku derdorê Çolê Xwê û gundên kurdan dem deman zîyaret kirine û li gor pîvangên dîsiplinên xwe muşahadên xwe wek etnolog, cografyacı û folklorzane nivîsandine. Hemîyan ji kurdan û pezxwedî kirine wanan da behs kirine. Pezxwedî kirin qelewîyê kurdên Anatolîyê Navîn bû.

Her gundekî kerîyên xwe yên pezî bi şîr û pezî mezman habûn. Bernîvro kerîyên pêz rêz bi rêz ji bo bêrîyê dihatin nav gund û berêvarê rêz dibûn diçûn mêrgan. Şênayîyêke bi dişlîk bû. Dengî zengilan, rojê du caran wek orkestreya senfonîyêke li nav malan belav dibû.

Herman Wenzel di kitaba xwe yê bi



Nuh Ateş, Seyfi Doğan, Muzaffer Özgür, Mem Xelikan, û İrfan Baysal li Çola Xwê.

navî *Forschungen in Inneranatolien Die Steppe als lebensraum* dinivîsîne ku; sedeme ku kurdên Anatolîyê Navîn asîmilê nebûnê û karektêrên xwe yên netewî bi serbilindiyekê parastine û diparêzine girêdaya xwebewariya (özgûven) wanan dike. Xwebewarî jî ji zenginîyê tê. Zenginî jî ji pezxwedî kirinê dihat. Ji bo ku aboriya kurdên Anatolîyê Navîn baş bû wanan kes di ser xwe re nedidîtin.

Gola Xwê nezîkî meqesê û herême Kuluyê kepeze dest pêdike. Wextê ku meri ji jorda li Çolê Xwê diner. Gol ê wek turikekî ye. Devî turik î berve Ankarê ye.

Wexta ku min Çolê Xwê dît henek bîranînen min şiyar bûn.

Dema ku ez î zarok bûm kerwanên hêştiran ji Xelikên Jêr, ji bo firotinê xwê tînan gund. Wexta ku me dengî zengilên kerwanê, ji perî gund da dibihîst me zarokan xeber didan hevdu û berve kervanan dimeşîn.

Hêştiran, nerm û nerm wek kayîxeke li ser avê pêl û pêl rîya xwe dewam dikirin. Serî kerwanê kerekî an jî kerekê dikşand. Em heta ber camîyê gund, bi rahêlê kerwanê diketin.

Kerwan ji zarokan re dibû dişlîkekê û jîyana yekawa qelew dibû. Me zarokan pişqulê hêştiran ên hêşik, berhev dikirin û pê li serî hevdu têxist.

Hatina kerwanên xwê dibû sedema hekatên kerwanan û hêştiran. Piranî ji li ser kîndariya hêştiran bûn. Digotin



hêştiran bîrdariyêke xwe ya pir pêşte çûyî heye û heqaretên ku pê tîn kirin ji bîr nakin.

Me wexteke bi aliyê rojhelatê Çolê Xwê da erebe ajot bi şunda em hatin çihê ku em li nav golê bigerin.

Li wir çend dukanên hediye difrotin, restorant û ciyekî dest û lingên xwe lê bişoyî hebû. Gelek erebe û otobusan li ciyên parkê park kiribûn. Piraniya zîyaretçiyên turist bûn. Berî ku em herin nav golê, me ava vexwarinê kirî. Her kî ji me şûşeyeka avê yî di dest bû.

Ji bo ku baran, biharê pir barîye, ava golê yê îsal nemicikî ye. Ser Çola Xwê bostek av hebû. Av li ber bayî bakurî yî hênik, hêdî û hêdî pêl dibû. Nav golê qerebelix bû. Hinekan xwe li ser xwê dirêj dikir, hinekan jî derlingên xwe helmaştî, lingên xwe dikirin nav xwê. Hinekan jî bi çamurê kevîyê golê xwê xwe reş kiribûn. Ma xwedê kesî bêhêvî û bêteselî nehêlîne.

Me jî, derlingên xwe helmaştin û ketin nav golê. Em ê pêxwas in. Kirîstalên xwê wek sirîyên tuj di binî lingên me re diçûn. Em ê li aliyê ku gol dest pê dike da nî. Aliyê bakûr. Herdê ku em lê bûn pir nê berfireh bû. Li hemberî me, aliyê rojava da Kepezê Kuluyê xuya dikir. Lê wexta ku me li aliyê başûr mês dikir golê wek çoleka sipîyê bêdawî bû. Xofekê digirte

ser însên. Ruhî însên xwe bi tenê hîs dikir û bêçarekiyekê xwe li canî însên dipêca. Nezanîyê me yê ji bo jîyanê û dînanê zelal xuya dikir. Pirsên hebûnê mêjoyê însên mûjli dikir.

Me bihîstibû ku avê bi xwê yê ji bo xurê lingan baş e. Em li ser golê demekê gerîyan û me lingên xwe bi xwê mist dan û bi ava golê şûştin. Me bi kamera telefonê wêne kişandin. Ê di nav me da ku bi xwê û bi avê xwê en pir xenê bû yî, Muzaffer bû. Şîşên avê boş, tijî xwê û ava xwê kir. Me jî jê re alikarî kir. Nuhî Hecê got; em berîyên xwe ji Muzaffer re tijî xwê û ava xwê bikin. Roj ê li ber ava ye. Me demakê rojava temaşe kir.

Roj giran û giran diçû ava. Em li navberê heşiniya avê û şewetê ezman de manî. Her ku roj nezîkê ufûqê dibû, avê golê jî wek ezman dişewitî û arreng dibû. Pêlên ser avê wek alavên agirekî pêl û pêl ba dibûn. Qaqlîbazên (Marti) ku berve rojava difirin dibûn yek kozî dişewitîn. Kristalên xwê, dibûn yek almas reng û reng dibirikîn. Golê Xwê bi rengên sor, zer, sipî û hêşinî xwe xemiland. Dîmeneke magî, esrarangîz û sirtijî em mest kirin. Em mat bûn. Em temaşevan bûn.

Ji hevdû veqetîn birînek e. Hele ji rojê. Ji ronahiya rojê. Ji germê rojê veqetîn kanîstanke xemgînî ye.

Wexta ku rojê li ber ava bû min



Çola Xwê.

berê xwe berve rojê kir û got; Hamata, Hakhata û Hvarsta!

Rojê li berava ye û roj çû ava. Çi gotinên xweş in! Ew pêy ê cografyekê îzah dikine. Cografyêke ku xwedîyê van peyvên lê bi cîhbûyî. Civata ku li rojhilatê kevîyekî çemekî bahr û golekê an jî nezîkî avê bi şun bûyî ye. Ez weng difikirim. Dibe ku şaş be. Zimanzane dikanin li ser vê bifikirin.

Wexta vegeerîne hat. Em ê li kelekê erebê dewastinî. Nuhî Hecê yî di bin simêlan re xerman û xerman dikenê û yî jî rewzê memnun xuya dike. Muzaffer kerîyêk şûşê kirine destên xwe. Mem Xelikan î bi Îrfên ve ketine sohbetake tîr. Elî bi erebê re mijul e. Ez î hevalan temaşe dikime. Xenê û

serbilind im.

Van însanan, ronakbîrê kurdên Anadolîya Navîn in. Emekdarê kovara Bîrnebûnê yên bi sala ne. Van însanên nasnamê û tarîxa kurmancên Anatolîya Navîn bi nivîs peyda dikine, diparêzine, pêşte dibine û wek mîrasçandî ji generasyonên du xwe re ci dihêline.

Van însanan jîyanên xwe risk kirine! Van însanan mîrên cesaretê ronakbîrîyê ne! Van însanan merxasên nefsbîçûkîyê ne! Însanên fedakar in! Ji evîniyên xwe fedakarî kirine! Ji peran fedakarî kirine! Ji xewên sibê fedakarî kirine. Ji hesretên xwe fedakarî kirine û hîn jî dikine. Tav û tav! Heyfa mêran! Mala we ava be, hevalno!

Em li erebê siwar bûn. Elî pêle marşê na. Lê ereba me serî lê diheze. Em bi ser rê ketin. Erebe guhmadê, erebê him serî lê dihezê him jî yê giran terê.

Yên ku ji ereba fehm dikin ji erebê dêhatin û pêşila erebê vekirin. Lê tu avil nekirin û vegeŕîyan hundirî erebê. Minaqeşekê kûr dest pê kir. Eceba çi be. Herkesekî tiştek got. Min got; mazotê gemarî ye an jî avê teve mazotê kirine (ki ehliyeta min tune û ez ji ereban jî pir fêhm nakim). Lê ew gotina min çend rojên bi şunda Elî serrast kir û got; a te rast derket!

Me xwe bi petrolî Bozlak Tesîsleriyê gîhanda, em ê ku mazota pak bikirinî. Erebe hêdî û hêdî terê û yê ji me re li qurnê têxine. Em ê erebê dipesininî ku ma me li rê şerpeze neke. Çimkî devî dikevê şevê. Em ê tarûmar bibin.

Me, giran û giran rê pê dikir. Rê otoban e. Lê der û der ê asfalta nu rêtêxine. Wexta ku erebe giran tere, merî doralîyê xwe hing baş dibinê. Mêla min terlên ku li kevîyê Golê Xwê hatî çînîn kişandin. Dêmekî li cîhê ku avê xwe yê şor e jî genim û çê yî dirize. Li ser pîyê rastê li gelek terlan kelekê Koçhîsarê rişandi bûn.

Wexta ku em gehîştinî têsîsa Bozlak, me erebe perk kir. Me dest û lingên xwe yê bi xwê sipî bûyî, li ser kanîyê şuştin û li restorantê rûniştin.

Êvar e, lê hîn jî hewa yê germ e. Dêrdorên restorantê bi dîwaran girtine, bayî nelivê. Soşê Ankara û Aksarayê qerebalix e.

Tesîs gelek mezîn bû. Tesîsî li ser rîya Anakara û Aksarayê ye. Berve Adana tesîsî li ser pîyê çepê dikeve.

Cîhê ku me xwe lê bi şun kir pak û fireh bû. Alternatîvên runîşkandinê pir bûn. Ciyên ku wek odên kurdan bi balîf û xaliyan rexiştî hebûn. Motivên xaliya û balîfan reng û bi reng bûn. Motivê cîhgir dara jîyanê bû. Rengê hakîm sor bû. Li wan cîyan bi piranî turistan xwe bi cîh kiribû. Em li ser kursiyan runiştinî.

Çêşt û çêşt bihna xwarinê dihat. Me li mênûyê nêrî. Giloktîya dîwê tesîrê xwarinan jî kirîye. Xwarinên herêmî êdî bûne nostalgî. Îmkanên însanan zêda bûne. Însan digerine. Restorant jî, li gor mêvanên xwe he-reket dikine û îhtiyacên wan tinîne cîh.

Îrfên li menûyê meskir bi şunda got; dema goştî karika ye. Goştî karikan insanî tam wê wextê bixwe. Bi avê goşt zêd bikelînî. Zêd li ser nanî ser sêlê kî û rûnî mîyanî ku hatiyê qijilandin li ser kî. Dêw jî jibîr nekî!

Menû giranîyê xwe goşt bû. Ew jî yê normal e. Goşt, him di mutfaxê kurdan da him jî di yê tirkên û welatên din da cîhêkî fireh digirê. Çêşt û çêşt

salata. Sê xwarinên masîya hebûn. Manti hebû. Piraniya hevalan masî si-parîş kirin.

Nuhî Hecê, bi garson re got; ma masî min ji Golê Xwê be û gotina xwe berdewamkir; ji Golê Xwê masîyan nêcîr dikine û bi cewalak pere difiroşine. Heval kenîn.

Garsonan berî ku xwarin anîn ser masê, bi heşinîyê teze, bi ava sar û nanî ser sêlê yî teze mase xemilandin.

Roj di paş çiyayî Karacadağê re çû ava.

Li ser wê axê ku em nuha lê runiştine gelek xelkên din ji runiştin. Hitîti, Frigyalî, Galat, Grek, tirk û Kurmanç. Pir ne li dûr e. Di kelekê gundî Altîlarê re berve gundî Xelîka/jêr rîya herîrî derbas dibû. Li ser çiyayî Herşid (Xelîka Jor) û kirikî li gundî Bulduk qereqolên ku emniyetê rîya herîrî temin dikirin hebûn. Jêmayîyên xwe hîn li cîhên ku min bi nav kirî he-ne. Lê kîymetê wan mîrasanan kesî nizane.

Ku hîng ji bîr nekiriye, ez binivîsînim. Wexta ku em ketin hundirê rêstorantê ku xortekî li masê pêş runiştîye. Muzaffer silav dayê û hal û xatirê wî jê pirsî.

Me ew xorte dawetê masê xwe kir û hat li ba me xwe bi cîh kir û xwe da naskirin. Navî wî Ahmet Kara û ji gundê Incovê ye. Li welatê Svîssrê dijî.

Devdeva ku em rabin, garson hesap anî. Heval mîvanên min in. Ji mala min rabûn û min ew dewatê Çolê Xwê kirin. Li gor edetên me, divê ez mesref bidim ser xwe.

Ehmed, dît ku garsonî tê, rabû ser lingan û hesap ji dest garson girt û sond xwar û got; hesêp ez ê bidim. Ji bo ku hûn bi ser min da hatin. Rast e! Li gor urf û edetên kurdan rast e! Lê em pir in, mesref ê giran bibe. Min çir kir û nekir, Ehmed razî nebû û hesap da.

Em rabûn. Elî depoyê erebê tijî mazota pak kir. Erebe demekê çû bi şûnda ku serlêhezîya xwe kêmbû. Me Mem Xelîkan li Kuluyê dîna û rîya xwe dewam kir.

Elî ez û Nuhî Hecê li Xelîka/jor çî hiştin û bi Îrfên û Muzaffer ve di ser Kozanliyê re berva Atkafasiyê/ Yeşilyurtê ketine rê.

# Hecîyê Gulê

Seyfi Doğan

lo lo lo dilê min tine tine  
 jikîk Heciyê min mirîye,  
 hêstirkên min ên re li hev nadine  
 li ruyê min tîpekine  
 ne bi xagiya ne bi forta  
 şureta dilî Hesenî min e  
 zavê buka Heci min e

Lo lo lo nawim vê te.  
 min Fatik û Nurik dane duyê xwe  
 ku tu bi wana nehatî ser  
 mala Rehmê min a korocax e li derê te.

**Hecîyê Gulê** bapîrê min e. Ji gundî Xelika jor/Karacadağ, ji malê Mihê Rişê û ji Koma Rişîya ye. Navî bavê wî wek di kilamê şînê da derbas dibe Reşit Axe ye. Navê dîya wî Gula malê Hemîbirê ye. Hecîyê Gulê, birangê pênc xwengan û Hesenî Gulê ye. Hecîyê Gulê bavê du zarokan û Mêrê Eşê Asîyê ye. Navî keçikê Hecî Fatê Hecî û navî lêwik Îdkî Eşê Asî ye. Fatê bi navî bavê û lawikî bi navî dakê tê xwandin.

Dû wefatê Hecî yê xanimê Hecî li birayê wî Hesan mar dîkin. Ji Hesen jî lawik û keçikeke xwe tê dunê. Hesen di

şerê yêkemîn da li cephê şehit dikeve. Eşê Asîyê ji şehîtbûnê Hesen bi şunda bî dimêne û heta mirnîyê li ser zarokên xwe rûdine.

Hecîyê Gulê wek piranîyê kurdên Anatoliyê Navîn, bi pêz xwedîkirinê re mûjli dibû. Kerîyên xwe mihên bi şîr, kerîyê berxe û pezî mezman hebûn. Pezî mezman, ji pezî nerî sê salan re dibên. We demê berxe nêr ji bo firotinê sê salî dikirin û cere bi cere digehandine Samûlê. Wê gundê derdorên ku kurdên Anatoliyê lê bi cîh bûyî, tu bajarên ku ekonomiyê xwe bi hêz ku goştî ku tê berhem kirin

bihistînên tunebûn. Loma kurdên Anatolîya Navîn kerîyên xwe ye pezî nêr li Samûlê difirotin.

Dewletê Osmanî piraniya îhtiyacê xwe ye goşt, ji kurdên Anatolîyê Navîn temin dikir. Weng herkesekî nedikenî ku pezî xwe li Samûlê bifiroşe. Firotin li gor rê û rêbaz dimeşî. Qadîyê heremê bi belge, hejmarên pêz dinivîsand û ew belge ji Samûlê re dişand.

Hejmara pezî ku qadî nivîsandî divê ku were teslîmkirin û pez li gor peymanê, divê ku di wextê xwe da li Samûlê be. Li ser rê pez firotin qedexe bû. Xwedîyên kerîyan carûcaran, henek pezî xwe li ser deriyê xwe bi fiateke zêda difirotin. Çimkî Dewlete Osmanîya, pez erzan ji xwedîyan dikirî. Wexte ku hejmara pez kem derkeve, xwedanê pez dihat cezakirin û ji pezfirotine men dikirin.

Dema ku Osmanî hîn bi hêz bûn, leşkerên Osmanîyan kerîyên li ser rîya Samûlê diparastin û ji bo parastine emirên pir sert habûn. Ji bo ku ihtiyaca Istanbulê goşt, pêşwazî bibe ew tedbirinan şart bûn.

Cara dawîyê ku Hecîyê Gulê keriyê xwe dibe Samûlê, dema Osmanîyê bi teşqeleyê ye. Li gelek alîyan şer heye û rewze Osmanîyan him ji alîyê aborî û him ji alîyê askeriyê da pir xereb bû. Xelk edî ji şer û ji xizanîyê aciz bûbû. Desttengîyeke bîhad ê hekîmê civatê

bû. Xortan pirê caran eskerîya xwe dubara dikirin. Xortan êdî nedixwastin herin şer. Ji bo wê jî ji eskerê dirivîn. Ji bo ku jîyana xwe berdewam kin, dibûn eşqîya. Diberistêna gundan. Rewî tazî dikirin. Ji qelewan xerac dixwastin. Wexta ku rewşa Osmanîyan hîn jî xerab dibe, di salên 1915-1924 li doralîyê gundên kurdên Anatolîyê Navîn jî ji bo sedemên jori eşqîya peyda dibin. Kalê min berî ku were kuştinê, çend caran bi bavê xwe ve û bi serî xwe jî pezî biriyê Istenbûlê. Tecrûbê xwe yê heye. Pir caran "kaçakçîyan" rîya wî derbend kirine û Hecîyê Gulê xwe bi peran xelas kiriye.

Mehmî Biçûkî gotinekê Hecî neqil dike: "Wexta ku kaçakçî derdiketin ser rîya me, min li çavên wana meze dikir. Ki serkeşî eşqîya çavên xwe berdidan erdê, min kêr, eger çavên xwe berdidan çavên min pere zêda didan."

Kaçakçiyên li Yalovayê tên deriyê Hecî û jê beleş, çend pezan dixwazin. Hecîyê Gulê, naxwaze pezî xwe bi wanan de. Şerî dest pê dike. Hecî û şivanê xwe yê li wir têne kuştin. Navî şivanî wî ku tê kuştin Hesê Xelê Kulik e. Ew li wir tên vegeyandin. Ji kaçakçîyan jî çendek ê dimirin.

\*

Hecîyê Gulê kîjan salê hatîyê kuştine kesî baş nizane. Lê li gor xwedê dayîna zarokên Hecî, meri dikane texmînekê

bike. Mesela lawikî xwe Idkî Eşê Asîyê yî, li salê 1904 hatiye dîne û du salan bi şunda Fatê Hacî yê tê dunê. Hecîyê Gulê salekê ji xwedê dayîne kecike xwe Fatê Hecî dunê xwe diguhere. Hingê merî dikine bibêje ku Hecî texminen neberê 1907 û 1910an ji aliyên kaçakçıyan ve tê kuştin!

Kilamê Hecîyê Gulê sed salî berve hatiye berhem kirin. Kilam texminên ji aliyê dayîka Hecîyê Gulê da hatiye gotin an jî ji aliyê xwengên Hecî da. Dibe ku kilam ji aliyê çend insanan va hatibe gotin û di nav hundire salên ku derbas buyî da bûye yek kilam.

Kanîstankên kilama şîne ya Hecîyê Gulê: Eşa Hecikuş (Ayşe Canpolat), Xecê Şemli (Hatice Kilickaya), Mehmî Biçûk (Mehmet Kilickaya)

Berhevkar: Suatî Xecê  
Hekatinivîs: Seyfi Dogan

*Veğerandin:* Di kilamê da, bi manê definkirinê hatiye bikaranîn. Li gor felsefa Platon û dîn va duna, dunêka derewîn e. Duna rast duna din e. Wexte ku însan dimire, merî vedigere cihê xwe yî rast û heqiqî.

*Zile:* Qezayeka Tokatê ye.

## Di helbijartina 19ê îlona 2010an de ji kurdên me yê Anatoliya Navîn ev kes ji bo meclîsa beladiyan hatin hilbijartin



Seyfi Doğan,  
wek Serokê Komela Sosyal Demokratîk li Vällingby ji bo meclîsa belediya Hässelby-Vällingby hat hilbijartin.



Ji Partiya Çep (Vänsterpartiet)  
Bekir Uzunel

û



Ji partiya Sosyal Demokratîk jî  
Serkan Köse li belediya Botkyrkayê wek endamên meclîsa belediyê cih girtin.



Hediye Güzel  
berdevkiya Partiya Çep (Vänsterpartiet)  
li belediya Nackayê wek cîgir hat hilbijartin.

## Kilama Hecîyê Gulê

hecîyê gulê, hecîyê gulê  
î mezedikê li dundilê  
hecîyo ev çiya, çiyakî bi kerx e  
kirîk hecîyê min wan zalimna dêxa ber xwe  
sêsid sîwarên zile rabe ser xwe  
hecî min ji cîya danexe

lo lo min go hecî yo were  
navbere min û te hendik der e  
lo lo hecî yo ma ew qurşuna were  
di serî kezêbê min ra here

lo lo were  
fatik û îdkê teyî li te guhdar e  
kare te çi ye  
te sewê çar pezan xwe daye wira

hecîyê gule, hecî yê gule  
hecî min jî sîwarê dundilê  
li tarafan gotin mirîyê reşit oğlu  
li gund tevenan gotin mirîyê hecîyê gulê

lo lo lo Hecîyo lêxine  
qurşuna tirkî bi çar peran li xwe mêxine  
mal şewitîno, ti ser ra bawên pê bêsinin  
hecî min î aticî ye  
qurşuna merkî mehcirî ti xwe negîne.

wan çiyana bi çiya sewandin  
êmilkên hecîyê min ê gurleh in dûyên xwe gerandin  
hecîyê min î bi heft xwenga ye  
cima cenazê hecî min bi xelkê şuştin  
bi çar tirkan vegerandin.

Berhevkar: Suatî Xecê

Rastnivîs: Seyfî Doğan



## Guranîyeli kurdgeli Şêxbizinî

Le î rujgele îma diwînin ke xalkeman fire le gûranî û kilame şêxbizinî elaqemend in û dixwazin ke ziwone xwêyan le medyaye sêr û guhdarî vikirin. Hama zanist û malumat le ser ziwone xuman fire kem e îma netanîn ke terze xoman vigirînîn. Yanî terze gûranîyelman gî yekîge û kelîmegeli naw gûranî û kilamgeliman henî kê we ziwonê xuman nîya. Min dipirsim ke era?

Îma xwazîm sifta vizanîn ke guranigeliman je ku hatige we şêxbizinîyeli noceyîn û werçeyîn çun guranî çirîgin.

Terze û şiveyî ke firevaniman lê îstifade dikirîn şeklê arabesk e û verdi kultur û ziwoniman elaqêj nî.

Terze arabesk kuştine kultur û ziwoniman e! Min nêwîşim ke bîra kesî we ziwone xuman gûranî we terze arabesk neçirî hama ra muhafaza kirdinê ziwoneman îma verci gi kilamgel aslî gurdo vikirîn. Yanî vînanîne şeklê guranîyel şêxbizinî ra îma fire girîng e. îmro le destiman xeylî îmkan hestin we îma ditanîn le înternete vînîn ke kurdgeli welatê aslîye xuman çun guranî diçirîn û ziwon û şiveyan çune. Mîsalî baş ra îma kurdgeli Kirmanşan, Xaneqin û Îlamin. Ure him şune werçeyîne îma û hem jî ziwone evane we ziwone xuman le kurdgeli dik herim neziki yek e.

## Şêxbızın Kürtlerinin Şarkıları

Bu günlerde bizler görüyoruzki halkımız şeyhbızın türkülerine epey alakadar oluyor ve istiyorlarki kendi dillerini medyada seyredip dinleyebilsinler. Ama kendi dilimizde malumatmızı ve bilgimiz az olduğundan kendi tarzımızı yakalayıp beceremiyoruz. Yani şarkılarımızdaki tarzımız birdir. Türkü ve şarkılarımız içindeki kelimelerin bazıları kendi dilimizden değil. Soruyorum niye?

Biz isterizki önce bilelim şarkılarımız nerden gelmiştir, geçmiş zamandaki şeyhbızınlar nasıl şarkılar söylüyordu. Çoğumuzun istifade ettiğimiz tarz ve şekil arabesktir Ve Kültür ve dilimizle alakası yoktur.

Arabesk kültürümüz ve dilimizin ölümüdür. Ben demiyorumki kimse kendi dilimizle ve arabesk tarzı ile şarkılar çığırmasın ama dilimizin muhafazası için her şeyden önce asıl şarkılarımızı toplayalım, derleyelim. Yani şeyhbızın türkülerinin şeklinin görünüşü bizim için çok önemlidir. Bu gün elimizde hayli imkan vardır ve biz internetten asıl vatanımızdaki Kürtlerin nasıl şarkılar çığırdıklarını, dil ve şivelerinin nasıl olduğunu becerebiliriz. Bizim için Kirmanşah, Khanekin, Ilam güzel örneklerdir. Ora hem bizim önceki yerimiz hem de onların dili ve bi-

Min dîşim ke helwestwan û guranîçirgeliman vixwazin terze guranîyeliman vigirin. Evane ditanin ke le her du terz sentezi baş xas vikarin. Tawsîyeye min eva ke îma ra guraniyel nû le terzi xelke ne le terzê kurdgele dîyargeli dik jî vingirin.

zîm dilimiz diğêr kûrtlerinkinden daha yakındır birbirine.

Ben diyorumki şair ve müzisyenlerimiz şarkılarımızın tarzını yakalasinlar. Onlar her iki tarzın sentezini iyi yapar, becerirler. Tavsiyem odurki biz yeni şarkılarımız için başka halk değilde başka diyarlardaki kûrtlere bakalım.

### Ferheng:

Fire: çok

Firêwan: çoğunluk

Gurani: şarkı

Eleqeman: alakadar

Erra: neden

Ke: asla

Sêr: seyretmek

Guhdar: dinlemek

Zanist: bilmek

Ziwon: dil

Naw: iç

Xuman: kendimiz

Zindigani: yaşayış, yaşam

Ver: beri/ön kısım

Wek: aynı

Nezik: yakın

Hertim: Herdem/herzaman

Şan diri/şan dayin): göstermek

Gişt: hep

O kese: o kadar

Sengi/grani: ağırlık

Dimîni/mayindin): kalıyor/kalmak

Diwobiriski: parlıyor

Wobirisk: parıltı

Biriska: şimşek

Dikey: biraz

Bal: akıl, dikkat

Noce: geçmiş zaman

Çirandin: çağırma, çağrı

Gurd: toplamak

Girîng: mühim

Çüne: nasıl

Herim/irem: daha

Heni: bazı

**Kurtiyek ji pêşgotina kitêba***Ebdulrehman Seîd Zengene***Sofizim, cewherê ola pêxemberan e**

